


Sêwirmendê Serokdewletê Lubnanê yê berê Dr. Corc Dîb:

Li herêmê bêyî kurdan nîzama nû çenabe

✓ Bi taybetî dema ku li Rojhilata Navîn nîzameke nû bê danîn, bivê nevê dê kurd di nav de cih bigirin. Ji ber kurd di nava dilê Rojhilata Navîn de ne û hejmara wan jî ne kêm e. Mirov nikare wan biçûk bihesibîne. Lê divê kurd ji bo vê yekê xwe amade bikin û kongreya xwe ya neteweyî li dar bixin.


Bi vî awayî ew dikarin xwe bi cîhanê bidin pejirandin û bibin hêzeke karîger. Lewre dema ku kurd bixwazin bi dagirkirêñ welatê xwe re rûnin jî, ew xwe nadin ber. Ji ber ku ev tê wateya pejirandina mafdariya kurdan. R.8-9

Dîtina hevpar a hiqûqnasan:



✓ DGM wekî saziya hiqûqa ne-asayî û dûmahîka dadgehêñ leşkerî hatin avakirin. Meşrûbûna vê dadgehê her tim bû mijara nîqaşan. Bi taybetî hiqûqnasan her tim ne meşrûbûna wan anîn zimêñ. Lê ev dîtin bi bir-yara Dadgeha Mafêñ Mirovan a Ewrûpayê hate çespandin.

Li ser vê yekê girtiyêñ şoreşger ji bo ku meşrûnebûna DGM'ê bixin rojeva civakê dest bi boykotekê kir. Ji ber vê yekê ji 5'ê mehê vir ve salonêñ DGM'yan vala dimînin. R.3



SAMİ TAN

Her wiha gelo kesen ku dewlet li hemberî Dadgeha Mafêni Mirovan a Ewrûpayê xistine rewşa súcdaran, xesareke biçük dane dewletê?

Jî mêm gelek rewşenbîr û ronakbîrên tirk didin zanîn ku dijminê herî mezin ê dewleta tirk ew dewlet bi xwe ye. Lewre rayedarên vê dewletê bi hin kirinê xwe dewletê bi pêşberî cihanê şermezar dîkin û hin caran biryaren saziyên dewletê bi gotina klasik a rayedarên dewletê "bombeyê dixin bin hîmê dewletê". Bo nimûne gelo kî dikare bi qasî kesen bîryara ku girtina mebûsen kurdan dan, dewleta tirk li ser rûyê cihanê fedîkar û şermezar bike? Hê jî li qadênav neteweyî dema qala mebûsen kurd tê kirin, diplomatîn tirk xwîdanê didin.

Her wiha gelo kesen ku dewlet li hemberî Dadgeha Mafêni Mirovan a Ewrûpayê xistine rewşa súcdaran, xesareke biçük dane dewletê?

Jixwe tê zanîn ku her tevgera

dij-şoreşî ji bili xesar û rûxandinê bi kîrî tiştekî nayê. Her wiha her tevgera azadîxwaz û şoreşger jî li ser tişteku tê rûxandin avahîyeke nû û xweşik lê dike. Komara tirk hê negîştîye sedsaliya xwe ji hêla "parêzeren wê" ve tê rûxandin. Gelê tirk jî bûye pêlîstîkê van parêzeren sexte.

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan, di destpêka vê mehê de ji bo pêkanîna peywira xwe ya şoreşgerî şansekî nû da rayedarên dewletê û gelê tirk. Daxwaza ji nû ve sazkirina vê komarê bi zimanekî xweşik û bi biryadarî anî zimên. Lî mixabin rayedarên dewletê zont û burc xistine destê xwe her roj stûnekî wê komarê tînin xwarê.

Kurdan her tim di rojê teng de desten xwe dirêjî birayên xwe yên tirk kirine lê her tim rastî xinîz û zordestiyê hatine. Ev sê car in tevgera kurd şanşê bi hev re avakirina pergaleke demokratîk dide gelê tirk. Lî çelikên gurgebozan guhê xwe nadin banga aşî û azadiyê û nahêlin ku ev deng biçe gelê tirk jî. Nav di xwe didin û qebê

dixwînin. Yanê ji bo ku şer gurtir bibe, ci ji wan tê dîkin.

Piştî agirbesta ku roja 1'ê rezberê dest pê kir, digel rayedarên tirk, xapemeniya tirk jî xwe li keriyê danî. Xapemeniya tirk qet cih nadî nûçeyen li ser aştiyê, bi vî awayî nahêlin ku dengê aştiyê biçe gelê tirk jî.

Li ser vê yekê di serî de HADEP, derdorê demokratîk û welatparêz xwest ku dengê xwe riya xwepêşdan û mîtingen girseyî bigîhîn gelê tirk û raya giştî ya cihanê, lê mixabin ev rî ji hate girtin. Piştî ku li Edenevê mîtingeke bi girseyî hate li dar xistin û amadekariyê mezin hatin dîtin, ji nişka ve walîtiyên bajarên Amed, Wan û Stenbolê bîryara berbendkirina ragi-handin rîveberiyen HADEP'ê yên van bajaran. Bi vî awayî didin zanîn ku ew dê nehêlin ku dengê aştiyê bigîhîje raya giştî ya Tirkîye û cihanê.

Lê gelê kurd li ser bîryara xwe hişk e, dûr û nêzîk dê dengê aşî azadiyê bike dengê serdest.

"Efû" tevkuyiyeke bêdeng e"

M. ZEKİ ETİZ

Dî van demen dawîn de du mijaran rojev guhart. Yek ji wan hilbijartin, a din jî efû ye. Raya giştî ev demeke dirêj e li ser van babetan niqâş dike. Çima vê pêvajoya ku tevgera azadiyê di nav pêşveçûnê mezin de ye KT'ê bîryara hilbijartîn girt û dema wê diyar kir? Ji bo ci bêyî ku haya tu kesî jê hebe û bingeha wê hatibe dayîn piştî girtina bîryara hilbijartîn DSP'ê mijara efûye anî rojev?

Armanca dewleta tirk û hevalbendê wê ew bû ku di 1998'an de Tevgera Azadiyê ji her hêlê ve bixin tengasiyê û li quncikekî asê bikin, û marjinal bikin. Her wiha dewlet dixwaze rîexistin û derfetên ku gelê kurd bi xwîn û xwîdanê bi dest xistine birûxine, vîna wan bişkene, bi Kemalizmê ve girêde.

Hêza mîtinger bi "serkeftine-ke" bi vî rengî dixwest Peymana Lozanê û 75'emin salvegera damezirandina Komarê bi coşke mezin pîroz bike.

Ji ber vê yekê hêza serdest di destpêka 98'an de bi hêzeke mezin êrişî Kurdistânê kir. Li aliyeke bi hêza xwe li Amed, Botan, Dêrsimê êrişî ser gerîla kir, li aliye din jî bi şerî psikolojîk û bi rîbazîn hovane di warê legal de bi ser gel de çû, saziyên ku gel bi xwîn û xwîdana xwe ava kirine her roj beramberi êrişen hovane man. Mebesta KT'ê ew bû ku bi politikaya xwe ya gemar û bi şerî derûni vîna gel bişkene û gel çavtîrsandi bike, têkiliyên Tevgera Azadiyê û gel ji

hev qut bike, muxalefeta li hemberî pergalâ Kemalist bifetisine û bêdeng bihêle. Lî KT digel hevalbendê xwe bi ser neket.

Berevajî vê yekê ew têk çû. Şervanê azadiyê bi dirûşmeya "Di şer de serkeftin di jiyanê de azadî" û bi taktilka "Gerîla li her cihî ye, le ne li tu cihî ye" taktilkîn dijmin bi avê de birin û qada şer firehtir kir. Şervanê azadiyê ji Silêmaniye hetanî Derya Reş û Derya Spî bi cih

Berevajî ku bigîhîje armanca xwe, dewlet di marjinalkirinê têk çû. Gerîla bi dirûşmeya "Di şer de serkeftin di jiyanê de azadî" û bi taktilka "Gerîla li her cihî ye, ne li tu cihî ye" taktilkîn dijmin bi avê de birin û qada şer firehtir kir.

bûn û bi gelê Anatoliyê re bûn yek.

Bi taybetî di vê dema dawî de şer li her derê gur bûye, di warê ramyari û dîplomatîk de gavêne pir mezin hatine avetin. Li welatên Ewrûpayê her roj li ser keşeya kurd civîn û konferans têne lidarxistin. Konferans û meşen ku li bajarê Lozanê bo şermezarîne Peymana Lozanê hatin lidarxistin nişaneyê vê ya herî baş e. Komara Tirk ji bo ku têkçûna xwe û serkeftinê Tevgera Azadiyê veşîre pêşiyê hilbijartîn û piştîre jî mijara "efû"ye anî rojev. Jixwe taybetmendiyeke şerî kirêt ev e ku dema ku dikeve tengasiyê rojevê diguherine û bala raya

giştî dikişine aliyeke din.

Hêza mîtinger dixwaze "bi kevirek çend çukan bîne xwarê". A yekemîn ji rastiyê dûrxistina bala raya giştî, a duymîn veşartina qêrana hundirin e, a sêyemîn bi hêviyên pûc û derew gel bi xwe ve xapandin û dîlgirtina gel e.

Lê armanca KT'ê ya herî mezin bi "efû"ye ev e ku politikayen xwe yên hov di girtîgehan de pêk bîne. Weki ku tê zanîn bi dehan girti beramberî çavsonî û tevkuyiyan man. Dewletê dixwest vîna girtîyan bişkene û pergalâ xwe ya dijmirovî di girtîgehan pêk bîne. Lê dewlet li hemberî berxwedanê girtîyan bi ser neket.

Îcar jî dewlet dixwaze vê konenvaniya dijmirovî bi rengekî din bide meşandin. Hedefa dewletê ci ye? Di vê demê de du armançen dewleta dagirker li ser girtîgehan û girtîyên azadiyê hene; a yekemîn, berdانا kesen faşist,

nijde, diz û mafya ye. Bi vê yekê dixwaze başa raya giştî ya li ser girtîgehan belav bike, keşeya girtîgehê ji rojev derxe û xwe mina dewleteke demokrat xwe nişan bide. Ya duymîn, jixwe mebesta wê ya herî mezin bi "efû"ye êrişî ser dîlen şer û nasnameya wan bike û vîna wan bişkene, pergalâ hucreyê li her derê bide rûniştandin. Jiyana birêxistinji holê râke. Girtîyan bêraman bihêle, ji giyana şer û birdoziya mirovahîyê dûr bixe.

Bi kurtayî dewleta dagirker dixwaze bi "efû"ye rojevê biguherine, têkçûna xwe veşîre her wiha tevkuyiyeke bêdeng li girtîgehan pêk bîne.

Ferhengok

agirbest: ateşkes
aravtaravkirin: li derê nêrin
avibûn: çoleme, geronek
berevajî: aksî
bêhempa: bêpavan
bibok: badem
cîdarwaz: bölüçü
cespandin: tesdiqkirin
darizandin: mehkemekirin
desthilatdarf: iktidar
destumname: tütük
dilawerî: wêrekî, bêtîrsî
doşime: doşek
erîn: muspet, olumlu
gezirandin: kesaxtin (budama)
guncaw: lêhatî, musaît
helwest: tewr
hemetkirin: parastin
hevalbendî: ittifak
kardî: faal, etkin
kîpe: problem, arişe
lewî: ji ber ku, lewma
lêeyanbûn: içine doğmak

libûrjen: kesen ku livaya kulavan li kevanê dixe
livâ: heriya berxa
maf: heq
mafdarf: haklılık
maf çareniş: qedera xwe diyarkirin
mebest: niyet
mizik: kelmês
navgîn: amûr, alet
pejîrandîn: qebûlkirin
pergâl: sazûman, nîzam
pêgeh: kapsam, alan
rist: rol, dêwr
serjîmar: nifûs
seme: aqilsivik, tûtraquşî
serbaz: er
serç: dijwar, zehmet
satal: tolaz, berdoş
sanenavkirin: imzekirin
şenî: ahali
şewirmend: danışmman
téglibîstîn: fêmkirin.
yêşîr: hespîn sêw û bêxwedî

Dîtina hevpar a hiqûqnasan: DGM ne meşrû ne, divê bêrakirin

DGM heta niha beramberî gelek rexneyên zor tûj maye. Biryara dawîn a DMME'ê ya ku bi serîlêdana İbrahim İncal xwe da der, ji yek ji wan rexneyan e. Di biryarê de DGM Ji ber terefgiriya û ji ber tevîhevkirina darizandinên leşkerî û sivîl tê tawanbarkirin." Ev biryar bi gelemerî bêhiqûqiya DGM'yan dest nîşan dide.

Bi salan e ku li Kurdistan û Tirkîye saziyên nefermî li derveyî hiqûqê li ser gelan tevkujian pêk tînin. Yek ji wan jî DGM ye. Wekî têzanîn DGM saziyeke rewşa awarte ye. Ji dema damezrîna xwe heta niha ev sazi beramberî rexneyên zor tûj maye. Biryara dawîn a Dadeha Mafîn Mirovan a Ewrûpayê (DMME) ya pişti serlêdana HADEP'a İzmîrê İbrahim İncal ji yek ji wan rexneyan e. Ew biryar bi tevâhî DGM'yan rexne dike. Di biryarê de wiha tê gotin: "Ji ber ne bêalîbûna DGM'yan, ji ber lêpirsinên ne objektif, ji ber tevî hev kirina darizandinên leşkerî û sivîl û ji ber mîsogenerkirina ewletiya canê bersûcan, divê dewlet tazmînatê bide dozzdar." Bi rastî ev biryar dide nîşandayîn ku divê Tirkîye hiqûqa xwe di ber çavan re derbas bike û DGM'yan ji holê rake. Digel wê bi vê biryarê dê pêvajoya dayîna tazmînatê ya bo hemû kesen ku di van daghehan de hatine darizandin dest pê bike. Li gorî ragihandan dema ku ew vê yekê neke, bêguman dê ji Komîsyona Ewrûpayê vederkirin.

Digel biryara DMME'ê, DGM'yan ku ne meşrû ne ji aliye Tirkîyeyê ve hatine parastin û bi taybeti ji bi rîbazên taybet hatine bipêşxisit. Li ser vê yekê ji 5'ê rezberê vir de girtiyen zindanan ên PKK'yî û bi besdarbûna komên çepgiran çalakiya boykotê ya derneketina DGM'yan dan destpêkirin. Her wiha Baroya Stenbolê û TUHADDER'ê, ji bo girtina DGM'yan kampanyayek dane destpêkirin

"Dadgeha rûreşan"

Dema mirov çavên xwe li bûyerêñ dirokê bigerîne, dê diyar bibe ku dewleta tirk, sistema van daghehan ji ku girtiye. Pişti têkçûna serhildana Spartakus, daghehan taybet ên girêdayî Senatorê Romayê, bi hezar kes dane ser çarmîxan. Di serdema navîn de li Ewrûpayê Dadgehan Engizisyonê hemû kesen ku, li dijî dêran derdiketin bi awayekî hovane û bi rîbazên dijwar ji holê dihatin bêrakirin. Her wiha li Italyayê ji Musollîni, ji bo parastina dewletê di sala 1926'an de daghehan taybet damezran-

dine. Li aliye din li DYAY'ye serdema Mc Cathy û darizandinêne awarte yên li daghehan Perûyê balkêş in. Wekî mînak dadageran ji ber pê ewlenebûna jiyana xwe bi maskeyen reş tevî danişnan dibûn. Li ser vê yekê gel jî navê 'dadgeha rûreşan' li wan kîrbû. Mirov nikare DGM'yan KT ji van yekan cuda bifikiye. DGM dimena rîkxistina kontrgerîla ya hiqûqî ye. Yanî rîkxistina yekem a di şerê taybet de ye.

DGM'yan pêşin di sala 1973'yan de di 26'ê meha pûşberê de bi qanûna 1773'an hatine damezrandin. Pêşin li İzmîr û Edenê, piştre ji li Enqere, Stenbol û Amedê hatine damezradin. Statûyeke taybet dane DGM'yan Amedê û 20 bajar bi DGM'yan Amedê ve hatine girêdan. Bi çalakî, protesto û boykotîn gur ên muxalefeta wê demê DGM ji aliye Dadgeha Zagona Bingehîn ve yanî di 6'ê gulana sala 1975'an de qanûna damezîfîna DGM'yan tê betalkirin û di 11'ê kewçera sala 1976'an bi awayekî hiqûqî DGM ji holê têrakirin.

Pişti 12'ê rezberê daghehan ku rîberîya DGM'yan dikirin, Dadgehan Rewşa Avarte hatine damezrandin. Kenan Evren roja darbeyê di televîzyonê de wiha dibêje: "Ji bo pêkanîna serweriya zagon û rîkûpêkiyê, dê bergîriyên idarı û qanûnî bêr girtin da ku dadgerên jêhatî û bitecrûbe karîbin bêtirs biryaren di cih de bi lezgînî bigirin." Ji daxuyaniya Evren mirov dikare rewşa dadgerên tirk fêm bike. Wekî mînak di dema terora 12'ê rezberê de dagehan rewşa awarte, di navbera sal û nîvekê de der barê 650 hezar kesî de doz vekirine. Der barê 700 kesî de cezayê idamê xwestine, 517 kesî cezayê idamê xwariye, ji 124 kesen îdamâ wan hatiye pejirandin, 50 kes hatine idamkirin. Her wiha 14 hezar kes ji hemwelatiyê hatine xistin û xebatê 23 hezar û 667 komeleyan hatine sekinandin. Her wiha 30 hezar kes ji karêñ xwe hatine avêtin. Belê rewşa Tirkîyeyê ji salan vir de di nav kambaxiyeke bi vî rengî de ye. Dadgehan leşkerî yên rewşa awarte pişti 12'ê rezberê ji aliye Qa-



nûna Bingehîn ve di sala 1982'yan de têr asêkirin. Lî valahiya wan daghehan ji aliye DGM'yan ve têne dagirtin. Wekî têzanîn DGM nikarin ji cuntaya 82'an cuda bêr fikirin. Ji ber ku cuntayê Qanûna Bingehîn û DGM li gorî darizandinêne rîbazên taybet ên cîhanê saz kirine û ava kirine. Cuntayê sistêma darizandinêji sistêma Musollîni ya qanûna ji bo parastina dewletê daghehan taybet û ji qanûna AntîTerror a İngîllîstanê stanidiye. Yek ji van qanûnan şroveya fâşizmî ye, ya din ji qanûna têkbirina berxwedanê gelê bindest e. Ji ber vê yekê ji armansa damezîfîna DGM'yan ji holê rakirina kurdan û bi giştî ji têkbirina muxalefata civakî ya Tirkîyeyê ye. Li gorî vê yekê di qanûnê de DGM wiha tê şrovekirin: "DGM bi darizandina kesen ku sûcûn li dijî ewlehiya hundirin û ya derveyî pêk tînin peywirdar e. Her wiha sûcûn li dijî yekparetiya dewletê bi gel û welatê xwe û komara ku taybetiyen wê di Zagona Bingehîn de hatine destnîşan Kirin ji dikevin nav karêñ vê daghehan." Dîsa, gelek taybetmendiyen din ên DGM'yan hene. Wekî mînak DGM dikarin di rewşa awarte de, bibin wekî daghehan leşkerî û dikarin hemû sûcûran bidarizînin. Li aliyeke dewlet dibêje di zûtirîn katê de ji holê bêrakirin. Ew li ber efûyê ji û li ber darizandinêne objektif ji astenek e. DGM bo çeteyan bi awayekî kar dike bo kesen din bi rîbaizeke din kar dike.

Her çiqas mijar ne DGM bin jî, li ser pîrsen me hiqûqnasen navborî dîtinêne xwe yên li ser vê daghehan anîn zimên.

Yücel Sayman: DGM ne saziyên meşrû ne divê bêrakirin. Dewlet ji bo ku xwe biparêze bi zagonê taybet dadgehan ava dike. Dewlet dibêje; 'ezê xwe birêkxistin bikim, ê ku eleqeya xwe ji min bîne, êrisî min bike ezê bi wan rîbâzen xwe yên taybet bersivê bidim.' Li tu welati néziktêdayîneke ango qanûneke bi vî rengî tuneye."

Av. Engin Cinmen: Li gorî DMME'ye DGM ne meşrû ne. Ew alfigir in. Ew sistêma bi tenê li welatên ku bi rejîma leşkerî têr meşendin heye. Li welatên Ewrûpayê ez rastî tiştekî bi vî rengî nehatim. Ditîsim ku DGM ne dadgebin. Heta ku dewlet DGM'yan raneke nikare bikeve nav Ewrûpiyan jî.

Av. Osman Ergin: Divê em li ser dewletê rawestin. Bo me divê kes ne gitîng bin. Ango hinek dadgeh. DGM divê di zûtirîn katê de ji holê bêrakirin. Ew li ber efûyê ji û li ber darizandinêne objektif ji astenek e. DGM bo çeteyan bi awayekî kar dike bo kesen din bi rîbaizeke din kar dike.

Av. Aydin Erdogan: DGM di darezandinêne xwe de li gorî raporênu ku di encama işkenciyê de hatine berdest, bersûcan tawanbar dike. Kesê ku ji qanûna 168/2 tê cezakirin 11 salan girtî dimîne. Wekî mînak ciwanen ku di meclîsê de pankart vekirin û Esber yağmurdereli ji ber paragrafek nîvîs 22 sal û nîvan wê di girthigehê de bimîne. Yê ku ji mîrkujiyê tê cezakirin 15 salan girtî dimîne. DGM ne meşrû ne, divê bêrakirin.

Peymanê Sedabad û Bexdayê li dijî kurdan bûn

Piştî girêdana Pakta Sedabad, ew nameyên ku Nûrî Dêrsimî û rewşenbîrên kurd ên li derveyî welêt dijiyan, bo alîkariyê ji Civata Miletan re dişandin, hemû bêencam dimînin. Ji daxwazên kurdan re nedana bersiveke baş, rasterast girêdayî konevaniya vê paktê bû.

Wekî vê demê rista şoreşa Kurdistanê derneketiye pêş. Hemû dubendî li ser Kurdistanê kom bûne. Tu carî merc mîna iro ji bo serkeftina şoreşa Kurdisanê nekemilîne. Tê zanîn ku dubendî çiqas giran bibin, li gorî wê jî şer dijwar bibe, çareserî ew-qas nêzîk dibe û derfeta bidestxistina encamê jî zêde dibe.

Ji ber vê yekê KT'ê bi hemû hêza xwe dixwaze careke din bi hevalbendîn xwe re peymanan girêbide. Bi taybetî jî bi dewletênu ku Kurdistan dagir kirine re. Jixwe di dîroka Kurdistanê de serkeftinê KT ên li dijî serhildanê Kurdistanê û fetisandina kurdan, her dem bi vî rengî pêk hatine. Lî her dem lingekî wan jî şoleker û xayînê Kurdistanê bûne. Lingê wan ê Kurdistanê veşarî maye. Piştî têkçûna serhildanan ew ji aliye dagirkeran ve ji holê hatine rakirin. A duymîn jî dema mirov li bendîn hevkarî û peymanê wan mîze dike, tu carî bi rengeki vekirî li dijî gelê kurd nehatine diyarkirin.

Hêzên împerialist teví dagirkeren Kurdistanê herdem Yekîtiya Sovyetê wekî xetere didan xuyakirin. Bi rastî jî dubendiyêne hêzên împerialist ên digel Yekîtiya Sovyetê li pêş bûn. Heta dewletê împperialist dubendiyêne di navbera xwe de xistin rîza duymîn. Lewre dewletê împperialist ên mîna Îngilistan, DYAY û Fransayê ji bo serweriya xwe ya li ser herêmê pir zor li hev nedikirin. Bi hev re ji navendekê siyaset

diyar dikirin û li gorî wê pêk dianîn. Yekîtiya Sovyetê jî li gorî berjewendiye xwe bi her awayî dest diavêt herêmê. Bo nimûne, têkiliyêne wê yên bi hikûmeta Albay Abdulkérîm Qasim û Cemal Abdulnasir re û piştre jî têkiliyêne wê yên bi rejîma BAAS'ê ya Iraq û Sûriyeyê re nişaneyên vê ne. Yanê wê demê pakt bi rengeki vekirî dihatin meşandin û girêdan. Lî aliye wan ê Kurdishanê veşarî dima.

Mînakên vê yekê di dîroka Kurdistanê de gelek in. Em dixwazin li ser du mînakîn bisekinin.

1- Pakta Sedabad (8 tîrmeh, 1937)

Ev peyman di navbera Tirkîye, Îran, Iraq û Pakistanê de tê girêdan. Di şekil de, mîna ku didin xuyakirin, tu eleqeya wê bi pirsgirêka Kurdistanê re nîn e. Ew, armancêne vê paktê bi vî rengî diyar dikin:

Dewletênu ku di Pakta Sedabadê de cih digirin dema ku li ser pirsgirêken navneteweyî yên ku wan eleqeder dikin bisekinin û divê bi hev bişewirin, tu alî divê mudaxeleyî aliye din neke û tu alî divê sînorê aliye din binpê neke. Ger aliye beramberî erîsan bimîne dewletênu din dê li hemberî vê yekê helwesteke hevbes bigirin û hwd.

Belê dema mirov bi awayekî bi serebere lê mîze bike, li hemberî kurdan tiştekî bi xeter nîn e. Lî, dema mirov rewsa van dewletan digel pêvajoya ku ev pakt hatiya şanenavkirin bîne berçavan, wê xwes diyar bibe ku Peymana Sedabadê li hemberî kurdan hatiya girêdan.

Di wê pêvajoyê de li bakurê Kurdistanê Serhildana Dêrsimê, li rojhilate Kurdistanê lawaz be jî tevgera Simko heye, li başûrê Kurdistanê jî cih bi cih li hemberî Iraqê û İngîlîzan têkoşîna esîrên kurdan heye. Mirov dikare bîbêje li Kurdistanê bo dagirkeran û hêzên împperialist tu aramî nîn bû.

Hetanî wê demê dewletekê ji bo ku dewleta dagirker a li ser wî parçeyê Kurdistanê lawaz bike û hinekî serwerrya xwe li ser Kurdistanê xurtir bike, alîkarî dida esîrên kurdan ên li aliye din. Ev bêtir di navbera Tirkîye, Îran, Iraq û Iran û Iraqê de wisa bû. Bi Pakta Sedabadê re ev yek tê rakirin. Bi taybetî jî KT pirsgirêken sînorê rojhilat bi Îranê re çareser dike. Lewre, êdî tu alî sînorê aliye din binpê nake û alîkarîya esîrên parçeyen din nake.

Li aliye din jî pirsgirêka ku wan hemûyan di warê navneteweyî de eleqeder dike, bêguman pirsgirêka Kurdistanê ye. Jixwe, ji xeynî pirsgirêka Kur-

distanê tiştekî din ê ku wan ew qasî bi hev ve girêbide jî nîn e. Lewre di wan salan de berî her tişte armanca vê paktê fetisandina tevgera azadîxwaz a Kurdistanê bû. Em dubendiyêne hêzên împperialist

Yekîtiya Sovyetê re paşçav nakin. Lî, em dixwazin di vir de bibêjin kakilê Pakta Sedabadê li dijî Kurdistanê bû. Jixwe salân 1930'yî ji bo gelén rojhilatî li dijî hêzên împperialist û dagirker salân şerî rizgariyê bûn. Lewre, bi tenê dewletênu dagirker bi paktêne wisa dikaribûn Kurdistanê ji pêşketinê li cîhanê dûr bigirin. Bi taybetî jî ji pêşketinê ku li welatêne sosyalist derdiketin holê.

Nûrî Dêrsimî ji civata neteweyan re name dişine

Piştî girêdana Pakta Sedabad, ew nameyên ku Nûrî Dêrsimî û rewşenbîrên kurd ên li derveyî welêt dijiyan, bo alîkariyê ji Civata Miletan re dişandin, hemû bêencam dimînin. Ji daxwazên kurdan re nedana bersiveke baş, rasterast girêdayî konevaniya vê paktê bû. Yanê ew hewldana Nûrî Dêrsimî û rewşenbîrên kurd a ji bo vekirina şikendina çepêren teng ên li dor tevgera azadîxwaz a Kurdistanê, vê paktê asteng dikir û nedîhiş ku pirsgirêka Kurdistanê di Civata Miletan de were nîqaşkirin.

2- Pakta Bexdayê (1955)

Bi handana DYAY û İngilistanê pêşyê bi destê Adnan Menderes û Nûrî Saîd ev pakt tê girêdan. Piştre Îran û Pakistan besdar dibin. Bi taybetî Îran û Pakistan bi temamî li gorî siyaseta İngîlîzan tevlî paktê dibin. İngîlîstan hemû karêne paktê dixe nava destê xwe. DYAY jî wekî çavdîr teví paktê dibe. Ev pakt di bin navê "li hember xetere sosyalizmê" de tê girêdan. Xalêne din jî mîna Pakta Sedabad têne diyarkirin. Lî

helbet rastî ne wisa ye.

Di wan salan de her çiqas bêdengi, yek li Kurdistanê hebû jî, lê dema li pratika vê paktê tê nîrîn, diyar dibe ku li hemberî kurdan her dem bi hev re tevgeriyane. Lî, berevajî vê, di pirsgirêken din de (yên derive) qet bi hev re kar nekirine, heta li dijî berjewendiyen hev xebîne, biryar standine. Di mînaka Eşîra Cuwanrû ya ku li dijî Îran sefi hildaye de, ev yek bêtir zelal dibe. Eşîra Cuwanrû di sala 1956'an de li hemberî Îran sefi hildide. Piştî ku derfeta berxwedanê namîne, Îran bi hovîtiyeke pir mezin bi ser wan de diçe, ew dixwazin xwe bispêrin Iraqê. Lî rejîma Nûrî Saîd hemû deriyen xwe ji wan re digire. Mafê penaberiyê nade wan. Te-



Adnan Menderes

vî vê yekê, ew jî bi hovîtiyeke mezin bi ser wan de diçe.

Ji vê mînaka berbiçav ev encam derdikeve; ew, xalêne paktê yên li ser Kurdistanê bi temamî pêk tînin. Lî, li ser pirsgirêken li derveyî Kurdistanê li hev nakin. Bo nimûne, Hikûmeta Menderes hebûna dewleta İsrâîl dipejirîne. (Piştî vê, İsrâîl rastiya Kurdistanê bi temamî înkâr dike.) Ev yek li dijî politîkaya ereban bû.

(Dê bidome)

AHMED HÜSEYİN

Rêzimanê kurmancî

- Wane 31 -

SAMÎ BERBANG

Raweya mercî (hekani)

Pêkanîna vê raweyê nêzî raweya xwestinî ye, lê di vê raweyê de hejmara deman zêdetir e. Ev rawe bo xwe hin mercan divê û yan jî hin mercan datine ber hinekên din.

Dema niha

Lêkera raweya mercî di vê demê dişibe lêkera dema niha. Bi tenê peyva "heke" rengê meci dide hevokê. Li ser vê mijarê çend mînak:

Heke ez daran dibirim.

Heke tu serê wî dîşkinî

Heke ew pez diçêrîne

Heke ew dixwazin.

Heke hûn direvin.

Heke ew zû têñ.

Dema boriya têdeyî

Raweya hekanî ya vê demê dîsa bi peyva "heke" ji dirûvê rastîn ê wê demê vediqete. Ji bo ronîkirina mijarên çend mînak bes in:

Heke min got (tu jî bibêje)

Heke tu hatî (xeberê bide min)

Heke wî nan xwar.

Heke me ew dîtin.

Heke we ez dîtin.

Heke wan li te xist.

Dema boriya dûdar

Dirûvê vê demê di raweya mecri de jî naguhere, bes heke tê ber û bi vî awayî ew rawe pêk tê.

Heke te gotiye, lê xwedî derkeve.

Heke wî li te xistiye, tu jî léxe.

Heke tu çûye Amedê, gazi wî neke.

Heke ew hatine, bila werin.

Heke çûk fîriyane, dafik daneyne.

Heke hûn reviyane, tîrsonek in.

Dema boriya berdest

Di vê demê jî ji bili peyva "heke" tu guhartin di dirûvê hevokê de cêname. Her çiqas ev dem zêde nayê bikaranîn jî, dîsa jî mirov dikare çend mînak jî bo vê demê bide:

Heke min digot, bila wan nekira.

Heke te hêjîr dixwestin, te bixwara.

Heke wî ez didîtim, çîma nedigot.

Merca dema bê

Gava peyva "heke" bê serê hevoka dema bê, ew dibe hevoka mercê ya dema bê. hevok dirûvê dema bê ya raweya mercê digire. Bo sayîbûna mijarê dê ew mînak têrî bikin:

Heke ez ê biçim, hewce bi te tune.

Heke tu yê werî, lez bike.

Heke ew ê here, ew ci xaniyê çedike?

Heke em ê bistînîn, ew dibe ku?

Heke hûn ê bimeşin, zû rabin.

Heke ew ê bixwin, ji wan re bîhelin.

Çîrokiya dema bê

Ew her wekî çîrokiya dema bê ya asayı ye. Bo bi bîrxistinê mirov dikare çend mînak bide:

Heke ez ê bihatama, te çîma negot?

Heke tu yê biçuya, te çîma nebir?

Heke wî yê bida, çîma serhişkî kir?

Heke me yê biçanda, çîma nekiri?

Heke we yê bikola, ka tevir?

Heke wan ê biçiranda, we nakiriya.

Raweya mercû daxwazê

Di dema rîzkirina raweyan de qala vê raweyê nehate kirin, lewre ew raweyeke hevedudanî, ji raweya mercû daxwazê pêk tê. Peyva "heke" rengê mercê dide wê û dirûvê lêkeran jî rengê daxwazê dîdê. Dema mirov peyva heke bide ber mînak jî bo raweya daxwazê dê raweya mercû daxwazê derkeve holê.

Dema niha

Her wekî berê jî hatibû daxuyandin, dema niha ya raweya daxwazê bi alîkariya peyva "heke" dirûvê mercû daxwazê digire. Dê çend mînak têrî zelalkirina mijarê bikin:

Heke ez biçim, ew ê were.

Heke tu bixwî, ji kesî re namîne.

Heke ew were, kes li wir namîne.

Heke em herin, dê vira xalî bimîne.

Heke hûn bikirin, ez dê bifiroşim.

Heke ew bixwazin, ez dê bidim.

Çîrokiya mercû daxwazê

Di vê dema mercû daxwazê de dirûvê lêker dişibe, dirûvê çîrokiya raweya xwestinî, bes bi tenê li ber wê peyva "heke" tê danîn.

Çend mînakên din:

Heke min bidîta, min dê bigota.

Heke wî bigota, min dê bişanda.

Heke we bişanda, dê zûtirbihata.

Heke min bikola, dê av jê derketa.

Mercû daxwaza hevedudanî

Ji ber ku ev rawe bi alîkariya du lêkeran pêk tê, jê re hevedudanî hatiye gotin. Di vê raweyê digel lêkerê bingehîn, rissta lêkerâ bûn jî heye. Raya dema borî ya lêkerê û dirûvê dema niha ya lêkerâ bûn tê bikaranîn. Bo nimûne lêkerâ "birin" di vê raweyê de dibe "biribe". Mînakên din:

Heke ez hatibim, kê dîtiye-

Heke te dîtibe, bibêje.

Heke wê standibe, bila bîne.

Heke me gotibe, súcê me ye.

Heke we firotibe, kê kiriye?

Heke wan súştibe, çîma bi qirêj in?

Çîrokiya mercû daxwaza hevedudanî

Di vê demê de lêkerâ bûn jî di dirûvê dema boriya têdeyî ya raweya xwestinî de ye. Çend mînak bes in ji bo zelalkirina vê mijarê.

Heke ez çûbûma, min dê bidîta.


Heke wî xwestibûya.

Hete ew rûniştibûya.

Heke hûn hatibûna, baş dibû.

Agir û agirbest

NEJDET BULDAN



Dîrokzan dibêjin aştî jî kulturek e. Bi rastî ji bo têgîhiştina wê pêwîst nîn e ku mirov bibe dîrokzan. Tê zanîn ku aştî kultureke herî mezin e. Li cîhanê herêmén ku gihiştine wê kulturê, dixwazin her dem di nava aştiyê de bin. Civakên pêşveçûyi mirovên rewşenbîr û hemdemî ji wê çendê dixwazin. Ji ber wê çendê herêmén pêşveçûyi di nava aştiyê de ne.

Mixabin Rojhilata Navîn ji wê çendê bêpar e. Zêdetir ji dewletên dagirkeren Kurdistanê. Rejîmên wan, rayedarên wan û civakên wan. Mirov dikare bêje ku jiyanâ wan li ser şer e. Desthilatiya wan bi şer xurt dibe. Xîmên dewlet û sazûmankariya wan bi xwînê hatiye avdan. Firşkê wan bi xwînê hatiye birîn. Jiyana wan li ser xwînâ feqîr û jaran e.

Perwerdekirina tîrkan bi gotin û riştina xwînê tê xemilandin. Dema qala dîroka xwe dîkin xwîn ji devê wan tê. Bila navê siyaseta xwe danîbin: "Li welat aştî, li cîhanê aştî". Lî we çend qala aştiyê bikin ew qas xwînê

dirijinîn. Hem li welatê xwe û hem jî li cîhanê. Hemû dagirkeren Kurdistanê li ser navê îslamê xwînâ kurdan dirêjin. Pişti ku ereb, tik û faris ketine Kurdistanê jî, dînê îslamê bi mebesta parastina nîjada xwe dane xebitandin. bi gotineke din, kafran hindî (bi qasî) misilmanan xwînâ kurdan nerêtine.

Binêrin sazûmankarê Romiyan (osman) dema ku şer bi derdorêن xwe nekirbin, padîşahên wan kurên xwe kuştine. Ji bo desthilatiye birayan bîra, qralîçeyan (welîfe xatûnan) nevisiyê xwe dane xendiqandin. İro bi radyo û televîzyonan, di mizgeftan de Diyaneta Tîrkan xwînâ kurdan helal dike. Diyaneta Tîrkan li ser riya Şeyhülîslamên xwe yên ku xwînâ birayan li bîra helal kirine dimeşin. Sedam navê li bombekirin û komkujiyê 88'an bi ayetekê Quranê (Enfal) danîbû.

Ji roja Aştiya Cîhanê (1 rezber) heya niha PKK'ê agirbestek yekalî ilan kiriye. Belê em têgîhiştin ku dewleta tîrkan bi kurdan re aştiyê naxwaze. Ew ji siyasetek e. Em wê çendê normal dibînin. Lî belê çîma zanyarê dînê îslamê yên tîrkan û kurd dengê xwe bili nakin? Ma dîndarî, an jî misilmanetî parastina aştiyê nake? Çend ayet li ser aştiyê û mirovaniyê hene? Eger dîndarî ji bo Xuda ye, rewşa Kurdistanê çawa bala wan nakişine. Eger dîndarî ji bo Serleşkeriya Tîrkan eew çawa misilmanetî ye? Tê bîra mirovê

ku mirov bipirse; Gelo, hûn evdên Xwedê ne an evdên serleşkeriya tîrkan in? Gelo hûn natirsin ku ew agirê iro kurdan û Kurdistanê disotîne ê sibê bi bedena we jî bigire. Bîr û baweriyeñ we li ser wê nîn e.

Qala olî mijareke kûr e, ez naxwazim li ser wê gelek mijûl bibim. Li gorî perweerdekirina me misilmanan ev tişteye ji me re hatiye gotin. Yanî "tu bizani ku di rast gotinê de mirin heye, ji bo Xwedê netirse."

Lê mijabin kultura dagirkeren, kultura olî ji tevlihev kiriye. Em dibînin ku li Tîrkiyê parastina olî biçuk bûye. Hatiye ser destmalekî an jî "turban" ekêsekiniye.

Li Finlandiyayê Serokê Protestanan yê herî bilind (Başpîskopos) di hevdîtinêkê de ev gotibû me:

"Ez û hevalên xwe em rewşa Kurdistanê bi nêzîkatî dişopînîn. Kurd têkoşîneke pîroz dimeşînîn. Kurd heq in û hûnê bigihîn armanca xwe. Ez dînê îslamê jî baş dizanim û wekî dînê xwe humretê jê re digirim. Lê wekî ez dibînim, zanyar û rayedarên ola îslamî, wezîfeyen xwe wekî Xwedê emirkirî bi cih nayînîn. Diyar e ku ew ji gotinê Xwedê, natirsin. Ji leşker û rayedarên xwîxgar war ditirsin."

Têbinî: Navnîşana min elektronîk

E-Mail: Buldan @Compuserve. com

Hûn dikarin li ser vê navnîşanê peyamên xwe bi riya kompûterê ji min re bişînîn.

Bîranin ji bo şehîdên 24'ê rezbera 1996'an:

“Ew deh can bûn, hildan ala berxwedanê”

Dijmin, Şervanê Azadiyê wekî nokêñ nav diranan dibîne. Lê ew, nokêñ ji hesin in. Diranêñ dijmin yeko yeko dişkinin. Dijmin dibêje: “Ez dê Şervanê Azadiyê di nav devê xwe de hûr bikim.” Ev dem, demêñ pir dijwar in. Ger di demêñ wilo de şervan ne wekî nokêñ ji hesin be, wê ji rûmet û namûsa bibe.

Roja qetîsamê hikûmet li Amedê bû

Pişti 12 rezberê ji li ser Zîndana Amedê zordariya dijmin dom kir. Yek ji qetîsamê herî xedar ên li Zîndana Amedê roja 24'ê rezbera sala 1996'an hate İldarxistin. Sala 1996'an Mehmet Ağar bûbû Wezîrê Dadê yê Komara Tirk. Ji serê salê û bi şûn de dest bi êrişen li ser zîndanan kir. Dîlêñ ser ên PKK'ê, li Zîndana Amedê bi Newrozê re dest bi rojiya birçibûnê ya bêdümahîk kiri bûn. Di vê navê de li Komara Tirk hikûmet guherî û Şevket Kazan bû Wezîrê Dadê yê hikumeta Refah-yolê. Mehmet Ağar ji bûbû Wezîrê Karêñ Hundirin lê belê destê xwe ji gemariye neşûst. Li aliye din di meha gulanê de çepgirên tirk ji dest bi bizava rojiya mirinê kir. Di vê navberê de, rîveberiya zîndanê û dîlêñ ser peymanek girêdan û dîlêñ ser dev ji bizavê berdan lê belê tim û tim ji ji bo bizeveke nû amade bûn. Wexta ku rîveberiya zîndanê dîsa dest bi zor û zilma xwe kir, dîlêñ ser dîsa roja 22'ye rezberê dest bi bizaveke nû kir.

Dijmin, vê neqlî tişten herî mezin dabû pêsiya xwe. Li gorî vê ji hazırlıya xwe kiribû. Roja 24'ê rezberê Serokomar S. Demirel, M. Ağar, Şevket Kazan û İsmail Karadayi hatibûn Amedê. Tevî kontrayan li hev civiyan û planêñ xwe gerandin. Ji polis, tîmîn taybet, itîrafkar û ji gardianen zebanî hêzeke ku ji pênc hezar kesî pêk dihat, saz kir û li benda bersiva kontrayê li zîndanê man.

Roja 24'ê rezberê sêsem bû û roja hevditina menzelên 29, 33 û 18'an bû. Dîlêñ ser kom bi kom derdiketin hevditinê. Pêdiviyê xwe ên wekî, Teşt, satil û hwd ji ji mezêlén hevalên xwe digirtin. Koma duyem ji menzelê derket û hate hêla menzelên 35 û 36'an ku ji xwe re fîraqan peyda bikin. Li vê derê dijmin dest bi planê xwe yî gemar kir. 32 dîlêñ ser, di wî cihê teng de dorpeç kir û hemû derî hatin girtin. Plana wî ew bû ku, di şexsê 32 dîlêñ ser de, hemû dîlêñ ser teslim bigire.

Di dîroka mirovahiyê de mînâkên wilo pir kêm in. Wekî dilaweriya Babek ku, bi bîrdoziya Zerdeşte Kal, li hemberî erebêñ dagirker li dar xist. Erebêñ dagirker, canê Babek parce bi parce jêkir, Babekê leheng, mirina xwe pejirand lê koletî nepejirand.

“Ew deh can bûn, hildan ala berxwedanê” Bêtirs çûn ser mirinê, bi xwîna xwe xaka welat avdan. Pêşengêñ

wan, wilo bi heybet çirandibûn rûpelên dîroka gemar. Ew şagirtêñ Mazlum, Kemal û Xeyri bûn.

Lehengên 24'ê Rêzberê ji dehê sibehê hate saet sisê hatin dorpeçkirin. Dîlêñ ser bûn nokêñ hesinî û diranêñ neyarê faşist, yeko yeko di nav devê wî de şîkêndanin. Wan “Destek bêhna jiyanê” ji me re anî:

*ya ku, li nîvê tebaxê,
ji porê ronakrewanan tê
min ji te re anî,
ji lêvên Zîlanê
Dî lîva xwe ya dawiyê de (Z.Tak)
“Derkevin ji welatê
min”*

Bêguman pêñûs bi nivisina lehengiya van rîhevalan nikare. Lî



*Destek bêhna
ji xwîna ronakrewanê
ya ku,
di malzoroka tariyê de
wekî çîlk jiyanê
rijiyayî
min berhev kir
bêhna ronahiyê
bêhna jiyanê
ya ku,
di bêcîya ku,
li ser tallikê de.
Destek bêhna,*

divê were nivisîn, da ku em bibin dûvajoyen wan.

Şerê cengen giran, Rêheval Wasfi (Mehmet ASLAN) di pazdeh saliya xwe de, rihê berxwedanê girtibû ji Partiya Karkeran. Dilê wî çar mortal bû. Hêlan li xwe dida û digot: “Ez endamê artêşa gel im. Canê min ji pola ye, tev gule ye.” Kela dilê wî tu car sar nedibû. Tim digot, “Ezê ji dijmin re wekî Rêheval Hasan Hüseyin tenê hevokêkê bibêjim: ‘Derkevin ji welatê min!’”

Behsa milkayetan dibe lê belê

milyaket mirovên baş bi xwe ne. Rêheval Doktor (Rîdvan Bulut) ji bi xwe milyaket bû. Tivinga şehideki bî rûmet hildabû û bûbû Şervanê Azadiyê. Li hemberî gel û rîhevalen xwe geleki dilovan bû lê li hemberî heyar ji wekî polayê têrav bû. Zanabûna wî bi her awayî xurt û têr bû.

Nûnerê welatparêzî, rîhevalîfî û gelperweriyê, rîheval Cemal Çam bû. Bi bîr û baweriyeke kûr, ji bo girê-daniya bi Serok Apo re mînakeke mezin bû. Bi rihê Çardehê Tîrmehê ji jiyanê hez dikir. Ji bo vê yekê ji li ser rîça her çar lehengen tîrmehê, bêtirs ajot ser mirinê.

Şerê rojên giran û teng, Rêheval Hakkî Tekin, pir bi hêrs û heybet bû. Zîndan tim jê re teng dihat. Dilê wî ji bo rîhevalen wî, wekî Behra Wanê fireh, ji bo dijmiin dojeh bû.

Şoreşgerî denydarîya gel e. Di demen şoreşê de, mirov deynê xwe dide gel. Lî belê deynê Rêheval Erkan Perişan ji hemû deynan girantır bû. İmkana lêvegerandina deynen giran ji, tim bi destê mirov nakeve. Wê rojê ji bo Rêheval Erkan imkan peyda bûbûn. Dema dorpeçkirinê, di qulika deriyen menzelê de ji rîhevalen xwe re digot; “Deyne min pir giran e. Pêwîst e ez iro deynê li gel û Partiya xwe vegerimî”. Bi serfirazî deynê xwe da gel û partiya xwe.

Deyndarek ji rîheval Ahmet Çelik bû. Bi bîrindarî ketibû zîndana tarî. Dijmin di roja ewil de jê re gotibû: “Ger tu nekevî nav refîn girtiyen azadiyê, em dê baş li te mîze bikin. Nexwe em dê te bikujin.” Rêheval Ahmet yekser li wan vegerandibû: “Ji bo welat mirina birûmet, hezar car çêtir e ji jiyanâ bérûmet.”

Mîrxasî û dilaweriya kurdan, bi fîk û ramana Serok gîhîst qonaxeke zanîstîfîr. Rêheval Edip Direkçi, Nimet Çakmak, Kadri Demir û Kadri Gümüş ji, ji bo mîrxasî û cengewariya gelê kurd rîzanen mezin bûn.

Berî êrişê dîlêñ ser di qulikên menzelan dan û standin. Pir bi kîf û dilges û her wiha ji bi hêrs bûn. Hevalina digot: “Em deriyen menzelan bîskînî û hevalen xwe bifiltin. Em çend xwe bi agirê pîroz bisewîfîn.” Li ser vê yekê heval li hev civiyan û bi vî awayî bîryar girt: “Zedetirfn wê me bişinîn Dîlokê. Jixwe bo me hemû girtîgeh wekî hev in.” Lî dema dijmin êris bir ser hevalan hemûyan dest bi dirûşmeyan kirin: “Bi xwîn, bi can em bi te re ey Serok!” Ji menzelan 36'an dengeke bi heybet bilind dibû:

*Amed... Amed...
Em tu car dev ji te bernadin
Em ê dest biavêjin keziyên te
Me sond xwariye Amed
Em ê te bikin bûka Medya
(Ali Temel)*

ÇIYA AMEDÎ / GIRTÎGEHA SEMSÜRE

□ 28 rezber 1991:

NÇM hate damezirandin

Navenda Çanda Mezopotamya bi armanca ronikirina çand û hunera gelê kurd li Stenbolê ava bû. Pêşengiya vekirina wê ji çend rewşenbirêne wekî Musa Anter, Ali Temel, Süleyman Danişman û hwd. kir. Di demeke kurt de bi dû Stenbolê de li Hewlîr, Amed, Edene, İzmîr, Mêrsin û Ruhayê şaxen wê hatin vekirin. Şaxen Amed û Ruhayê ji allyê dewleta tirk ve hatin girtin û ew niha girtî ne.



□ 01 rezber 1996:

Kovara Jiyana Rewşen dest bi weşanê kir

Kovara wêjeyî, çandî û hunerî Jiyana Rewşen di bin banê Navenda Çanda Mezopotamya yê de 1'ê kewçera 1996'an dest bi weşana xwe kir. Kovara mehane Jiyana Rewşen heta niha bîst û sê hejmar derketiye û weşana xwe bê navber dom dike. Di kovara ku xwerû bi kurdî tê nivîsin de bi piranî li ser mijarêne wêjeyî, tê rawestîn.

Festivala Şanoya Kurdi gihîst armanca xwe Ji Şanoya Kurdi pêngavek



Fetîvala Şanoya Kurdi ya 1. di navbera 3 rojan de bi serkeftin qediya.

Akademiya Çand û Hunera Kurdistanê, di pêşketinêna şanoya Kurdi de pêngaveke dirokî avêt. Ji aliye Akademiya Çand û Hunera Kurdistanê ve, di navbera 17-19 rezberê de li bajare Berlinê Festivala Şanoya Kurdi hat çekirin. Di her sê rojê festivalê de ji aliyeve li ser şanoya Kurdi niqaşen kûr hatin kîrin, ji aliyeve li jî, şanogerên ku ji her parçeyên Kurdistanê tevlî festivalê bûn, lîstîkên xwe pêşkêş kîrin.

Fetîvala ku şanogerên wekî Şemal Eba Reş, Şadan Fûat, Şemal Omer, Niger Hezip û Kemal Raûf Hencîne beşdar bûn de, bi kêmânî rojê nêzîk 300 kesen biyanî û kurdîn li der dorê Berlinê dijin, ziyaret kir. Festival, bi axaftina Nûnerê Akademiya Çand û Hunera Kurdistanê dest pê kir. Nûnerê akademîye di axaftina xwe de got ku wê de salên pêş de jî, festivalên wisa werin lidarkistin.

Ji her derê mesajên piştgiriyê

Piştî vê axaftinê, mesaja Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê (ERNK) hat xwendin. ERNK, di mesaja xwe de got Festivala Şanoya Kurdi di diroka Kurdan de cara yekemîn tê çekirin, ev pêkanîn, ji bo pêşketina şanoya neteweyî ya Kurdistanê hewldanekî giring e.

Ji aliye kî din ve Teatra Jiyana Nû ya Navenda çanda Mezopotamya yê jî, ku li Kurdistanê û Tirkîyeyî de bin şerîn zor de xebatên xwe yê hunerî dimeşînê mesajeke piştgiriyê şand festivalê. Teatra Jiyana Nû di mesaja xwe de kêmâsiyê şanoya kurdi bi bêdewletbûn û parçebûna Kurdan ve girê da û got "festival, Şanoya Kurdi xwe ji bo sedsala were amade dike."

Teatra Jiyana Nû di mesaja xwe de diyar kir ku wê girêdayî biryaren festivalê bin û herwiha wan festival ji bo sazikirina Şanoya Kurdi weke serkeftinekî nirxand. Teatra Jiyana Nû mesaja xwe wiha domand: "Em xwe ji

vê xebatê dûr nabînin. Şanogerên Kurdan bêguman, di azaadiya kurdan de wê rolekê bileyizin. Em ê biryaren we di xebata xwe de wekî bingeh bigidirin."


Şanogerên Kurdan li ser dîkê bûn

Piştî mesaj û axaftin derbasî beşâ lîstîkên şanoyê semînere li ser Şanoya Kurdi bûn. Di roja yekemîn de, pêşî şanoya "Pir" ku ji aliye Meki Kasap ve hatiye nîvîsandin hat pêşkêşirin. Kasap ku li Akademiya Çand û Hunera Kurdistanê Şaxê Berlinê xebatê xwe dimesîne, di şanoya xwe de mijara parçebûna Kurdistanê bi pîrekî anî ziman. Piştî lîstîka "Pir", lîstîka ku ji aliye Bekir Reşid ve "Li benda Şemî" derket ser dikê. Vê lîstîkê, efsaneyeke ku di diroka Kurdistanê de derbas dibe ji xwe re kiriye bingeh û bi zimanê şanoyê di navbera kevn û nû de têkiliyekê datîne.

Di festivalê de ji aliye Baran Ferşin ve bi navê "Li Rojhîlatê Kurdistanê Dîroka Şanoya Kurdi" semînerek hate pêşkêşirin. Di semînerek xwe de Ferşin got, li rojhîlatê Kurdistanê wekî her piştî şanoyê jî, piştî sazbûna Komara Mahabadê dest pê kiriye. Ferşin, lîstîkê ku di dema Komara Mahabadê de hatine listin mînak da. Piştî semînere Ferşin, rejîsorê Kurd Mehdi Caf, semînere bi navê "Li derveyî welêt piştgirîkê şanoya Kurdi" da. Di semînere xwe de Caf, piştgirîka heri mezîn a şanoya li derveyî welêt, wekî ji hev dûrbûna şanogerên kurdan nişan da.

Her wiha di festivalê de ji bili van, gelek semînere hatin li darxistin û lîstîkê din jî hatin pêşkêşirin. Di dawîya festivalê de hin xelat jî, ji şanogeran re hat diyarkirin. Şanogerên tevlî festivalê bûn, di mijara çekirina şanoyeke neteweyî de ramanen wan yek bûn.

PERWER BENGÎ/ BERSSLÎN

ÇAVDÊRÎ

Qudbê zemên Apê Mûsa

MİRHEM YİÇİT

Her meh û her hefteyê bêje hema şehîdeki me heye ku em bi bî binin. Însanî, rézdarî û qedîrîn bibiranîna wan dixwaze, jiyana bi berpirsiyari û hismendî jibîrnekirinê ferz dike. Kesê ji bîr bike ew dê di nav deryaya jibîrbûnê de noq bibe, zû yan dereng dê wenda bibe, dê mîna sturehê keran biqele û dê tu bîna û şop jê nemîne.

Şehîdîn welat ne yêni ji bîrbûnê ne, çu çarî û şert û dijwarî ci di bin bila bibin ew berdewam divê di bîra me de bin, divê dengê wan ji guhê me dernekeve, tim bala me li ser rî, fikir û dûrişmeyen wan be û em divê bi minasebetê cur bi cur, em çendî girêdayî wan in, bidin xuyakirin.

Meha rezberê bûye meheke ji mehîn şehadet û wefatên navdar. Ne meh, belê rojekê me ku tê de hêjayedî me, mîrxas û fîrîsekî me şehîd neketibe maye gelô?

M. Xeyrî Durmuş, Kemal Pir û Mehmed Sîncar di vê mehî de şehîd ketin. Di vê mehî de li biyanîstanê Yılmaz Güney serê xwe danî. Apê Mûsa şehîdê vê mehî ye.

Ci roja rewşenbir û şexsiyeten kurd ne ji koledaran re belê ji gel û wefatê xwe re kar kirine, dewletê ew girtine, sirgûn kirine û ku teslim nebûbin, kuştine.

Di 20'ê rezbera sala 1992'yan de jî piştî çend girtin û nefîkirinan, di temenekî 74 salî de dewletê Apê Mûsa jî gulebaran kir. Apê Mûsa buha û bedêla wê ci dibe bila bibe ji ser a xwe nehat xwarê. Hayê wî jê hebû û piştî mirina xwe jî difikirî: "Lawo min heta niha xwe pîs nekiriye. Min xwe kêm nekiriye. Ez divê heta mirina xwe wiha bim, dinya ne ev kîlik tenê ye." Hisê wî li ser pêşerojê bû û baweriya wî xurt bû bi tarîxê.

Apê Mûsa wiha digot ji destîvirîn dewletê re: "Em binêrin bê ka dîrok dê bi qencî behsa kî ji me bike. Behsa min an behsa dozdarên devlok."

Heta niha di dîroka zordarên tirk de gelek dozger û sawciyên Apê Mûsa û kesen mîna wî, tawanbar kirin hatin û çûn. Yekî ku dîrokê bi qencî behsa wî kiribe tune. Ji niha pê de jî dê neke.

Lê dîrok iro bi awayen geleki berbiçav û di merasim û salvegeren biranînan de bi giramiyeke mezîn behsa Apê Mûsa dike. Em meqale, kitêb, broşür, programen radyo û televîzyonan li aliye bihêlin, ji sala 1993'yan û bi vir de her sal ji aliye Medya Kurdi ve li ser navê Apê Mûsa xelatên rojnamegeriyê têne belavkirin. Bi navê Apê Mûsa gurûbén şano û hunerê çebûne û hezkirina beramber wî sal bi sal çend qat dibe, ew bûye wesileya serbilindayiyê, ne bi tenê ji bo kurdan belê bi qasî wan ji bo tirkên baş jî.

Di meqaleyeyeke xwe de Apê Mûsa xwe û Platon bi uslûbê xwe yê gelekî aqil-mend û nefşbiçûk muqayese dike û bi navê Platon van çar tiştan dihejmêre:

"Şikir ji Xwedê re ku ez Atînayî me, azad im, mî im û di zemanê Sokrates de hatime dinê." Em jî em kesen imkanen me çebûn, em Apê Mûsa ji nêzîk de nas bikin, pê re rûnîn û bibin guhdafe sohbeten wî, em gelekî kîfxwes in ku me ew nas kir û em di zemanê wî de hatin dînyayê.

Zemanekî di nav xelkê kurd de ji bo kesen mezîn, mentehî, xwedîhuner û bikapashî, "qudbê zemên" dihate gotin. Peyva qudb dibe ku ne kurdi be, ya zeman ji wiha. Her wiha dibe ku dînî bin û bêhna zimanê medreseyan ji wan bê. Xem nakek, ziman hêjayedîye hevbeş e û ji giş nîrxen din zêdetir kolektif e, çeket e ku li gorî destê tê de xizmetê dike. Ya din mebest li vir ne esil û zîkmaka gotinan û ne ji aliye efîmolokjîk e. Mesele hêza gotinê ye, gotin çendî li hedefa xwe dide, çendî barê xwe hildigire û tiştê jê tê xwestin çendî tîne cih.

Ji bo Apê Mûsa ji em dikarin vê peyvê bêjin: Ew qitbekî zemanê xwe bû.

Şêwirmendê Serokdewletê Lubnanê y Li herêmê bêyî kurdan nîza

Bi dîtina min kêseya kurd ji hemû kêseyên sedsala bîstan dijwartir e. Her wiha ji ber ku gelê kurd ji bo serxwebûnê ji tiştekî xwe nade alî, ev kêse dijwartir û çetintir dibe. Gelê kurd ji bo doza xwe amade ye ku her bedelî bide û dide ji. Dîvê kurd li ser hêza xwe ya çekdarî û navgînên rizgariyê perwerde bibin. Her wiha dîvê kongreya xwe ya neteweyî li dar bixîn.

Di nava Neteweyên Yekbûyî de serjimara şêniya gelek dewletan ji ya kurdan kêmîr e. Li aliyê din her çiqas di belgenameyên NY'ê de mafê çarenûsiyê té parastin ji, gelê kurd hîna ji vî mafî bêpar e. Gelo çima?

→ Bi dîtina min kêseya kurd ji hemû kêseyên sedsala bîstan dijwartir e. Her wiha ji ber ku gelê kurd ji bo serxwebûnê, xwe ji tiştekî nadîn alî, her tişti didin ber çavên xwe, ev kêse dijwartir û çetintir dibe. Gelê kurd ji bo doza xwe amade ye ku her bedelî bide û dide ji.

Li aliyê din gengeşî û nakokiyê navneteweyî ji, li ber kurdan dibin asteng. Ez her tim du tiştan dibijêrim, bijartina di navbera qanûn û sîyasetê de. Lewre hemû qanûnên navneteweyî ji bo kurdan mafê dewleteke serbixwe dinasin. Bo nimûne, destûrnameya Neteweyên Yekbûyî vî mafî dide kurdan. Lewre her gelekî ku bixwaze pêşeroja xwe bi destê xwe diyar bike, dikare ji bo vê yekê hemû metodan biceribine. Di nava van metodan de têkoşîna çekdarî ji cih digire.

Bêguman di warê qanûnî de, gelê kurd maf heye ku dewleteke xwe ava bike. Her çend ev qanûn, di nav bîryarê Neteweyên Yekbûyî de hebe ji lê nave-roka wê teng e. Li layê din dîvê em mafan û bicîkirina wan ji hev vejetinîn. Xebitandina mafê çarenûsiyê mijareke siyasiye. Dema ku em vê yekê dibêjin, ev nayê wê wateyê ku tu em rûmetê nadîn qanûnan. Berevajî vê yekê rûmeteke mezin didin qanûnan. Ji ber ku dema hin kes li dijî te delilekî pêşkêş bikin, ger tu ji mafdar bî, dê qanûn te ji biparêzin. Ev xalêن qanûnên navneteweyî, ji bo avakirina dewletekê pir guncaw in. Lî xwegi-handina van mafan û qanûnan tiştekî din e. Bidestxistina van mafan girêdayî destkariya (mudahale) navneteweyî û hêza kurdan e.

Di nava dewleten cihanê de li ser mafê çarenûsiyê du dîtin hene; dîtinek lê dixebite ku dewleten herêmekê li ser bingeha aborî û ewlekariyê bîne ba hev. Bo nimûne, Ewrûpa, Başûrê Rojhilata Asya, Rojhilata Navîn. Bêguman alîgirê vê dîtinê karîger û xurt in û lê dixebeitin ku vê yekê pêk bînin. Dîtina din ji, berevajî vê dîtinê mafê çarenûsê yê gelan di-parêze. Ev dîtin ji bêguman karîger û xurt e. Li dijî vê dîtinê Sekretêre Giştê

Neteweyên Yekbûyî yê berê Birêz Butrus Galli wiha dibêje: "Ger em bi vê ramânê karê xwe bimeşinîn, dê li ser parzemîna Afrîqayê hezar dewleten serbixwe bêne damezrandin."

Li pey van dîtin û nirxandinan diyar dibe ku, kurd dikevin nav neteweyên ku li riya avakirina dewleteke serbixwe bigerin.

Baş e, astengên li ber vê dewletê gi ne?

→ Wekî min da xuyakirin, bêguman gelê kurd maf heye ku dewletekê serbixwe damezrîne. Lî ev her du ramânê di nava dewleten cihanê de, astengan li pêşîya kurdan dertînîn. Bi taybetî helwesta Dewleten Yekbûyî yên Amerikayê (DYA) di vî warî de girîng û karîger e. DYA di warê aborî, siyasî û leşkerî de li cihanê dewleta herî bi hêz û karîger e. Ji ber vê yekê nexwaze desthilatdariya xwe ji dest bide. Lewre nexwaze hêzeke alternatif li dijî wê derkeve. Loma DYA nahêle ku dewleten Ewrûpâye bi Rûsyayê re hevkariyê bikin. Ji bo vê yekê DYA dest bi firehkîrina pêgeha NATO'ye kir. Li ser vê armancê DYA girîngîyeke mezin dide Tirkîyê. Wekî diyar e, Rojhilat Navîn bo DYA'ye gelekî girîng e. Ji ber ku Îsraîl li vê herêmê

nûnertiya Amerikayê dike, DYA dixwaze Îsraîlê ji bike endamê NATO'ye. Lewre ji Îsraîl û Tirkîyê li ser bingeha leşkerî û aborî hevalbendiye danî. Dema em bala xwe bidin ser vê mijarê, DYA wekî Tirkîye û Îsraîlê dibêje: "Îran, İraq û Sûriye dewleten terorist in." Balkêş e ev her sê dewlet jî hemşînorên Tirkîyê ne. Ji ber helwesta van dewletan, dijwarî û zehmetiya avakirina dewleta kurdan xwe dide der. Ev helwest, pişî Şerê Kendavê (Körfez Savaşı), dema ku Amerikayê parêzkariya basûr û bakurê İraqê dikir, bêhtir diyar bû. Ger DYA'ye bixwesta, ji bo dewleta kurdan şertîn herî baş vê demê pêk hatibûn. Ji ber vê yekê pêwîstiya kurdan bi parastinê û alîkariya mirovahî heye. Her wiha pêwîstiya kurdan ji aliyê leşkerî ve bi dewleten din heye.

Wekî we ji da zanîn, ji bo mafê çarenûsiyê bikaranîna quwetê ji bo kurdan meşrû ye. Lî çima Neteweyên Yekbûyî quwetê bikar neyne û bi rola xwe rabe?

→ Her çiqas qanûnên navneteweyî ji bo bidestxistina mafê çarenûsê bikaranîna quwetê meşrû dibînin ji, DYA mafê xebitandina quwetê bi bîryara Neteweyên Yekbûyî ve girêdaye. Lî NY'ê ji

bêyî destûra DYA nikare tiştekî bike. Çawa ku Amerikayê ji bo sazkirina "Pergala Nû ya Cihanê (New World's Order)" li dijî İraqê ji bo Kuveytê dest avêt metodên çekdarî, kurdan ji maf heye ku ji bo rizgariya xwe têkoşîna çekdarî bimeşinîn. Her wisa digel vê, dîvê wekî Lubnanê têkoşîna siyasi ji bimeşinîn û doza xwe ya serxwebûnî bi cihanê bidin pejirandin. Potansiyela kurdan têra vê yekê dike.

Lê dema kurd mafê xwe yê meşrû bikar tînin, bi teroristî û cudaxwazîyê tén tawanbar dikan. Gelo Neteweyên Yekbûyî ango dewleten mezin nikarin navberkariyê bikin û vî serî rawesînin?

→ Pêkhatina tiştekî bi vî rengî gelekî zor e. Berî her tişti heta niha kesî doza gelê kurd nebiriye rojeva Neteweyên Yekbûyî. Ev ji dihêle ku doza kurdan li bin banê NY nayê nîqaşkirin. Wekî çawa ku Tirkîye li dijî vê yekê derdikeye û Amerîka ji piştgiriya wê dike. Lî dîvê kurd hêvîşkéstî nebin û ji berê bêhtir haziriya xwe bikin û qurbanan bidin. Ji ber ku doza wan bêhemîpî ye û riya ku dane ser gelekî dijwar û zor e.

Corc Dîb,
têkoşîna çekdarî
ya kurdan meşrû
dibîne lê
pêwîstiya
têkoşîna siyasi ji
tîne zîmîn



Dr. Corc Dib:

Kanûna nû çenabe

KURTEŞİYAN: D. Corc Dib, di sala 1931'ê ji dayik bûye. Ew, ji herêma Korayê bakurê Lubnanê ye. Xwendina xwe ya pêşin li bajarê Terablîsê biriye serî. Peyre li Zanîngeha Amerika ya li Bêrûdê xwendîye. Xwendina xwe ya bilind li Hollandayê berdewam kiriye. Ew di sala 1955'an li ser Qanûna Navneteweyî ya Giştî ji Zanîngeha Amsterdamê diplomaya doktorayê wergirt.

Piştî vê yekê li Zanîngeha Lubnanê mamostatiya qanûna navneteweyî ya giştî kir. Di sala 1971'ê der barê helwesta İsrailê li hemberî filistinîyen sivil de pirtük nivisi û xelata Komeleya Hevalbendê ya Niviskarê Lubnanî wergirt. Corc Dib yekemîn kes e ku li ser qanûna koçberkirina navneteweyî ya Neteweyen Yekbûyi pirtük nivisiye. Her wiha bi alîkariya Zanîngeha Harverd li ser qanûn û delova avakirinê pirtük nivisi.

Corc Dib, rewşenbirê yekemîn bû, di sala 1967'an de got: "Heta mercen Lubnanê nayen pejîrandin, divê dewleta Lubnanê neçe ser maseyê". Her wiha li dijî Peymana 17 Gulanê ya di navbera İsrail û Lubnanê hatibû girêdan, derket. Di sala 1984'an de li ser daxwaza Serok Dewletê wê demê ye Lubnanê Raşid Keramî, bû şêwirmendê (danışman) wî. Wî, bêhtir li ser kêşeyen navneteweyî şêwirmendiya Raşid Keramî kir. Piştî ku Keramî cû ser dilovaniya xwe, dest ji karê şêwirmendiyê kişand. Niha li Zanîngeha Amerika ya li Lubnanê bi karê mamostatiyê radibe.

Neteweyen Yekbûyi heta niha gelektawanbarêne ser darizandine. Lé ji bo komkuji úzilma li ser gelê kurd tiştekî bi vî rengî nekiriye, çima?

→ Ev ji girêdayî helwesta DYAYê ye. Lewre divê dewleteke mezin van îhlal û komkujiyan bîne rojeva NY û biryara darizandinê bide standin. Ev ji bo doza kurdan pir zor e. Lewre em dibînin ku gelê kurd digel komkuji û çewisandînen ku li ser tê kirin, DYAY ji bo rewşa kurdan biryara deverên parastinê girtiye. Ji bili vê tu tişt nekiriye.

Dema ku li Rojhilata Navîn tevgerek aştixwaz bê danîn, dê tesîra kurdan şawa be ango dê bo wan ji aştîyek were rojevê?

→ Bi taybetî dema ku li Rojhilata Navîn nîzameke nû bê danîn, bivê nevê dê kurd di nav de cih bigirin. Ji ber kurd di nava dilê Rojhilata Navîn de ne û hejmara wan ji ne kêm e. Mirov nikare wan biçûk bîhesibîne. Lé divê kurd ji bo vê yekê xwe amade bikin û Kongreya xwe ya neteweyî li dar bixin. Bi vî awayî dikarin xwe bi cîhanê bidin pejirandin û bibin hêzeke karîger.

Niha yek li başûrê Kurdistanê û yek ji li Ewrûpayê du parlementoyen kurdan hene. Gelo mimkûn e ku ev parlemento bi şêweyekî resmî werin qebûl kiran ango meşrû bin?

Ji bo ku jê re rûmeteke navneteweyî bê dayin, dibe ku bête naskirin. Lé ez ne bawer im. Gelek dewlet ji ber têkiliyê xwe yên bi Tirkîyeyê re xwe nadîn ber vê yekê. Li aliyê din dewletê ereb jî, ji parvekirina Iraqê ditîrsin û dibêjin dema ku Iraq bê parverkirin, wê dever bi giştî were parverkirin. Rewş niha li Tirkîye û Iraqê ne baş e û her wiha ji bo kurdan jî ne erêniye. Ji ber hin sedemîn derveyî, ez nexwazim li ser vê mijarê zêde baxivim. Lé ez dixwazim kurd di çarçoweya

yekîtiyê de têkoşîna xwe bidin.

Niha li Kurdistanê hêzeke siyasi û leşkerî heye. Ev hêz li gorî pîvanen ser tevdigere. Gelo dibe ku ev hêz di warê navneteweyî de wekî hêzeke meşrû bê dîtin?


→ Di qanûnê navneteweyî de xebitandina şîdet û tehdîte ne meşrû ye. Lé ji bo xweparastinê û mafê serxwebûnê têkoşîna çekdarî meşrû ye. Lé belê tişte girîng ev e ku, divê dewletek bi awayekî fermî piştgiriya kurdan bike û bibêje têkoşîna çekdarî mafê kurdan e. Lé heta niha gotin, kurd li hemberî tîrkan rabûne û tîrk jî di ser wan de diçin. Bi kurtayı kîşeyâ kurd wekî bûyereke navxweyî dihesibînin. Divê dewletek bi awayekî fermî bêje ev dozeke navneteweyî ye.

Sedema vê polîtîkayê ci ye? An dixwazin gelê kurd xwe bispêre kesen ku welatê wan dagîr kirine an jî dixwazin bi gelê kurd re bi hev biçin?

→ Mebesta min ev e, divê kurd pir bixebeitin, da ku xwe bi dewletê din bidine qebûl kîşeyâ. Lewre dema ku kurd bixwazin bi dagîrkerêne welatê xwe re rûnin jî ew xwe nadîn ber. Ji ber ku ev, pejîrandina mafdarîya kurdan e.

Nexwe ji bo ku tevgeran kurdan meşrû bê dîtin, divê ci bê kirin? Ku rewş wisa bidome dê kî kurdan biparêze? Diyar e ji bili têkoşîna çekdarî li ber destê kurdan alternatifek nîn e.

→ Em dizanîn ku kurd têkoşîna xwe parastinê didin. Lé dê kurd heya kengê têkoşîna çekdarî bidomînin? Heya ku Neteweyen Yekbûyi hebûna wan bipejîrine. Digel wan astengîyan jî tevgera kurd hêzeke têkoşer û karîger e. Ji ber ku di gelek warêne girîng de giraniya kurdan heye. Ji ber ku ew doza xwe dimeşînin. Ger ku gelê kurd xwe nekira goriye doza xwe, nedîghîst vê qonaxê û



Dr. Corc Dib

dê ji holê rabûya. Digel ba û bahozên hatine serî jî, gelê kurd heyina xwe daye çespendin û ew li doza xwe xwedî derdikeve. Ev ji serketineke geleki mezin û bêhempa ye. Ji ber vê yekê ez bawer im, dê rojekê kurd hebûna xwe bi cîhanê bidine pejîrandin. Lewre heta niha wekî kîşeyâ herêmî û navxweyî hatiye dîtin.

Behsa Kongreya Neteweyî ya Kurdan dibe. Gelo dê ev kongre bikaribe hemû kurdan li hev bicivîne?

→ Bêguman ez pêkhatina Kongreya Neteweyî ya Kurdan geleki pêwîst dibi-nim. Pêwîst e kurd li navendekê li hev kom bin û nexweşî û kîşeyen navxweyî çareser bikin.

Hûn pêwendiyen ereb û kurdan çawa dinirxînin? Gelo gavênu ku tê avêtin, wê terî pêwendiyen rast û têkûz bikin?

→ Bi dîtina min ji bo vê yekê riya hevî baş, avakirina dewleteke kurd e. Dê ev dewlet, astengîyen li ber pêwendiyen kurd û ereban hilîne. Her wiha dê ev yek pêwendiyen kurdan û Sûriyeyê jî têkûz bike. Ji ber ku Sûriye alîkariya mazlûman dike û dixwaze mazlûm bigihêjin mafê xwe yên mirovi.

Li ser vê yekê polîtîkayekereban bi taybetî ya Sûriye û Iraqê heye. Dixwazin welatêne wan parce nebe. Bi rastî divê kurd vê helwestê bidin ber çavan, da ku çeper û astengîn li ber wan ji holê ra-

bin. Anglo kurd û ereb divê li ser bingeha wekheviyê, bi awayekî konfederalî aango federalî bi hev re bijin. Ji ber ku pêşeroja kurdan girêdayî ereb, ûrânî û tirkank e.

Hûn helwesta ronakbîren ereb a li ser kurdan çawa dinirxînin?

→ Ronakbîren ereb hay ji kîşeyâ kurd hene. Lé ne bi awayekî başebaş. Ji ber vê çende di vî warî de problem rû didin. Lewre ji bili Sûriye û Lubnanê pîraniya wan xwe dane aliyê Amerîkayê. Lé Sûriye û Lubnan jî di bin mercen sext û dijwar de ne.

Dîtinêne we li ser kurdan ci ne? Li ser radeya kurdan ya kesayetî ci ji wan tê xwestin?

→ Daxwaza min ew e ku, kurd ji bo doza xwe geleki baş bixebeitin û nexweşîyen di nava xwe de jî çareser bikin. Ji bo kurdan ji bili wan rîyan tu rî nemane: Yek, divê kurd baş li eslê xwe vejerin. Dudo, divê li ser hêza xwe ya çekdarî û navgînê rizgariyê perwerde bibin. Her wiha divê Kongreya xwe ya neteweyî li dar bixin.

Hevpeyvîn: ZUHEYR BÎRED
Ji erebî: CELALETTİN YÖYLER

Têbinî: Ev hevpeyvîn ji Kovara Sorgulê ya ku li Lubnanê tê weşandin, hatiye wergirtin. Kovar li Lubanê tê derxistin.

Kanîsark

Mala wan di newaleke kûr de bû. Çem çar bihust dûrî xêni diherikî. Çeberêni bihokan bi serbestî gîrs dibûn. Kevzeyê xanî xemilandibû. Di bin zinarê asê de xula xula ava kaniya sar bû. Par hemû ris den kiribû. Risê xwe ji baş hemet kiribû. Pişta xwe dabû darê û diponijî.

Badîn dar digezirandin. Perîşanê deng li Badîn kir:

– Ez dixwazim doşirmeyeke rengin û pir hêja çêbikim. Ez dê tiştekî bibêjîm lê tu neqehîrî!

Badîn li ser çeperê darê rûniş, çıxareyek pêça. Kaxiza di devê wî de mabû tîfî erdê kir û peyre li Perîşanê vegerand:

– Ji bo çî?

Min dil heye, ez navê Keçika Gulîsor lê bikim. Hê me ji tîrsê der û dora gora wê nexemiland. Hic nebe bila navê wê li ser doşirmeyê bête neqîşandin. Min xewn dît. Xezalê gotê min: “Şer qediya hêjî, ez nexwazim xisara min bigihêje we.”

Te bi van xewn û xeyâlê xwe ez jî gêj kirim. Ka te navê min û xwe lê dikir?

Ka te ji wê re digot, heyâ niha min nedizanî ez dareke hişk im an însan? Ma na-yê bîra te? Çawa tu hembêz dikirî, ji me re mal dişûş, dîz hazir dikir. Lawê me jî ji bo kêfê, dev ji me berda û terkî welat bû!

Çav li Perîşanê fireh bûbûn. Mîna belekiyên berfî bûn, di nava reşikahiyê de berfinan şewl dida. Pencî salî bû. Disibîya keçikeke çardeh salî. Heyvî digot: “Ez rind im” wê digot: “Ez.” Dilê wê bi qasî Koxî Çewlikê nêzî rojê bû. Dilorand:

Şevek ji şevén mîzgînan
Derî vebû odê şewl da
Ji min wetir dergûşa dilêm
Silav li me da.

Lê por sorê
Tu pêxembera sala îsal
Bi şev û roj ez dikalim
Hawar Xezal hawar Xezal

Bi sewta dengê Perîşanê re ji çavên Badîn hêstirêni germ û gîrs dibariyan. Ji darê daket. Das avêt û got:

– Eh! Dinyayek bi xem û kul... Bes e êdi! Nelorîne. Te bi vê lorandina xwe, di pazdeh saliya xwe de, ez kirim bin barê zewacê. Ma dawî li gotin û sewta te nayê? Tu ev qas gotinan ji ku dertîni?

Perîşanê bi lorandinê lê vegerand:
Lo hevalo lo delalo

Lolo qurban dibêjîm
Dilêm dilê xérnedîtiyan
Wexta ez bi êşa xwe hesiyam
Kulîlk û sosin dibeziyan

Belê zilamê wê rast digot. Şeniyê gund tev bi hesreta dengê Perîşanê bûn. Ew na-lîn û kalîn bûn. Berî ku Xezal dengê wê qeyd bike, haya kesî ji dengê wê tunebû.

Parçeyek nanê tenûrê di destê wê bû. Bang li mirîşkan kir: “Cû cû cû cû cû...” Mirîşkî lê civiyan. Peyre berê xwe da malê. Ji nav boxçeyê, gulîyên rengin ên ku wê û Xezal honandibûn, derxistin û li serê xwe pêça. Dengê kesan ji hewlî di-

hat. Derî vebû. Badîn bi kêf kete hundir:

– Merivê me û qîza xwe ji Edenevî hatine. Ên windabûyi, navê ciwamê Husêni, yê keçikê... zivirî:

Qîzam adî nedî?

– Sevîl

êla xwe kiriye. Niha ew û lêzimên wî bi telefonê pirsa hev dikin.

Husêni:

– Sûretên kesen ji êla me hene?

Perîşanê devê sandoqê vekir, ji sandoqê boxçeyek rengin derxist. Husêni yeko li sûretan nihêri. Sevîlê berê xwe dayê û dawiyê çıxlî bû:

Aoo! Ev kart çiqas xweşik e! Em ji bo Quncikê Şarkê hildin.

Husêni sûretê di destê xwe de maçî kir.

Di sûret de, kalek û keçikek bi cilênen gelêri tevgirêdayî, li cem pez diçêriyan, xuya dikirin. Çavên Sevîlê li cilênen keçikê ketin, di



Bi awayekî dûvedirêj pirsa hev dû kirin. Sevîl vepeleşî ba guhê bavê xwe û bi tirkî jê re got:

– Ger bav û diya keçika ku em ji bî-rayê min re dixwazin jî, wekî van in, ne hewce ye! Ev wekî Kiro û Çiyâyiyan in!

Madê Husêni tîr bû. Xwest ku qîza xwe bîne ser rî:

– Qîza min! Ev lêzimên me ne. Ev şest û şes sal in ku me hev du winda kiriye. Em dixwazin bi hev û din şad bibin. Jixwe birayê te jî sutal e.

Badîn careke din li Husêni nihêri. Rabû ew hembêz kir. Destê xwe da erdê û bir ser serê xwe. Bi kelogiri:

Xwezi niha bavê min zindî bûya û tu biditiya!

Perîşan:

– Em kurd mîna celebê ku gur bi nav keti, lêzimên me jî li “Cihê Radyoya Kurmançî” derketin. Dibêjin navê wî Keremê Seyad e. Wî di radyoyê de qala malbat û

cîh de sar bû û qiriya: “Terorîst”

Peyva terorîst bû bere û li canê Perîşanê ket. Bi rijandina xwelidankê xwest kela dilê xwe vemirîne. Pêşin ew peyre ji Badîn derket.

– Dibe ku mîvanen me birçî bin. Ka dîk bîne! Em ser jê bikin.

– Çima dîlik jehrê naxwe! Belkî goşte dîk li wê bibe derd û kul...

– Nezan e... Mîvan e. Ka te digot divê mîrov her kesî bi ava Kanîsarkê bişo.

Perîşan sekînî. Rûçik li wê hînek sor bû. Ev gotina Xezalê bû. Cû kulmek genim anî û bang li dîk û mirîşkan kir: “Cû cû cû cû...” di ber xwe digot: “Genimê Sevîlê ci ye gelo?”

Badîn dîk girt. Dema ser jê kir Sevîl ji derketibû ber derî. Bi herikîna xwînê re Sevîlê berê xwe jê bada.

Perîşan:

– Eferîm qîza min! Ji herikandina xwînê hez meke! Lî ev xwîna dîk e.

Dibêjin dema di xeberên televîzyonê de dibêjin, me ew qas “terorist” kuşun hûn li çepikan dixin! Carekê min û hevlan bi hev re birîna leşkerekî we yê dîl derman kir. Lî hovîn we serîyê xorten jê dikin, lingan didin ser û sûretan dikin.

Sevîlê tu tişt jê fêm nekir. Badîn hez gotina ji xwîn herikandinê hez meke we gerand.

Sevîl bi kêf ber bi kükîk ve beziya, çik êriş kir ku dev li laşê wê bike lê Banehişt. Gotina “Divê mîrov hînekân bi kanîsarkê bişo” di mêjiyê Perîşanê de gran dibû. Badîn, Husêni û Sevîl bir ser nîsarkê. Tarî ketibû erdê. Perîşanê li be ya gomê carekê du caran heste pêxist hîate malê.

Badîn: “Ka xwarin !”

Kevanîyê xwe giran dikir. Cû kulinê xwarina besî deh kesan amade kir. Dîkeke din li ser gomê heste pêxist. Dîkeftê de bersiv danê. Sifre amade bû. Bî dengêkî nîzm derî hate lêdan. Perîşanê bazda derî vekir. Her sê mîvan bir odaye Behsa Husêni û Sevîlê ji wan re kir.

Dema ketin hundir Sevîl qiriya û xwî avêt hembêza bavê xwe. Husêni Sevîl tawn da, rabû xêrhatin da wan. Heya şeşvan peyîvîn. Sozdar û Şevger rabûn. Şîlanê re:

– Hevala Şîlan tu ji bo alîkariya Xalîka Perîşan du rojan li vir bimîn, dê tu bi Sevîl re jî bibî heval.

Roja ku te de biçin Husêni û Seîlê ji wan xwest. Sevîl û Şîlanê hev û du hembêz kirin. Sevîl got:

Ez dê ışal dest bi xwendina zanîngekî bikim. Ez dê bi hevalen ku bi eslê xwe mînâ te kurd in re bibim heval.

Ber bi Perîşanê ve çû. Desten wê çar caran maç kir. Bi kenekî şîrîn:

Dayê! Mam Badîn gotinê te li ser kaniyê ji min re, bi tirkî got. Min bi ava kaniyê nîsarkê, ne tenê laşê xwe, min dilê xwe şûşt. Tu dizanî min ji bo ci nehişt bavê min Xatûnê bixwaze? Lewre birayê min serhevde ye, tolaz e.

Piştî ew çûn, Şîlanê mal tev de pagi kir, firaq şûştin, xwe tevgirêda, xatirxwe û lêxist çû.

Badîn bang li Perîşanê kir:

– Ka dasê bîne

Xweziya min bikaribûya navê bi hezran xort û keçan li ser doşirmeyê binivîcaya. Ez dê ji dêvîla wan navan, sûretê kam sarkê bineqşinim.

Badîn li zinar û kaniyê nîhêri. Ev gona ji çiroka Memê Alan bi lêv kir:

– Xwedê Teala wê şîn bike warê wi dan e.

Perîşan bi hutehuta pêlên çêm re desti bi loriyan kir:

Avê avê hê hê

Av serbetê

Şîlan delal min go

Tifing û çek

Li bejna te tê

Wê şîrînê

Tu dimesî hî hî

Mîna kewê hê hê mîna kewê

Ezê xewan heram bikim

Ji te re bîlorînîm

Mizgîn û xeberan

Her saet û gav bi gavê

● 26.09.98 şemfi:

Sahîya Salevegera Navenda Çanda Mezopotamya
Cih: Labela düğün salonu saet: 19-23.00

Li Navenda Çanda Medkom'ê

● 27.09.1998 yekşem:

Semîner: İnstîtuya Kurdi
"Serhildana Ağırlı û Xoybûnê"

Büşdar: F. Huseyn Sağrıç

Saet: 17:00



Li Navenda Çanda Mezopotamya şaxa Izmirê

● 26.09.98 şemfi:

Roja xwarinê kurd ên gelêri ya 26'an
Şanoya Hêvî, saet: 18:00

● 27.09.98 yekşem:

Şahi: "Dengê Bahozê", saet: 17:00

Li Navenda Çanda Alternatif

● 27.09.98 yekşem:

Konsera Grûp Munzur, saet: 15:00

Berhemeke çanda popüler:

Rizgarkirina serbaz Ryan

*Derhêner: Steven Spielberg
Serfîstikyan: Tom Hanks*

Hin film bi serfîstikyanê xwe, hinek bi mijara xwe û hinek jî bi derhênerê xwe tênaşin. Filmê bi navê "Saving Private Ryan" ango "Rizgarkirina Serbaz Ryan" jî bi derhênerê xwe Steven Spielberg nav da. Filmêni ku jî aliye Spielberg ve hatine kîşandin, geleki navdar bûne û jî hêla bi milyonan kesî ve li wan hatîye temaşekirin.

Ji Listeya Shindler bigire heta Amistad filmêni Spielberg di qada sînamegeriyê de bûne mijara gelek

nivîsan û hinek guftûgo bi xwe re anîne. Ev filmê wî yê dawîn jî bû mijara nivîsen gelek rexnegirêna navdar. Di van nirxandinan de encamêni li dijî hev derketin holê. Bo nimûne di rojnameya Ülkede Gündemê de pesnê film û derhênerê wî hate dayin. Li gorî nirxandina nivîskarê vê rojnameyê Spielberg bi riya vî filmî şer protesto dikir. Lî di nirxandina nivîskarê rojnameya Milliyetê de tiştekî dijberê vê yekê derdiket holê. Li gorî nivîsa di vê rojnameyê de, Spielberg her çiqas dîmenen şer bi hemû hovîya xwe li ber çavan raxistîbe jî, di dawiya dawî de neteweperestî bi ser aliye din ketîye. Sedema van dîtinê dijber di nava van gotinên nivîskara Radikalê de veşartîye: "Di nava film de mesajeke zelal û diyar tune. Spielberg deriyê şirovirinê vekirî hiştiye."

Di dema temaşekirina film de mirov dikeve nava hest û ramanêni jî hev cûda. Li aliye mirov li hemberî hovîtiya dîmenen şer heyîri dîmine, tevî leşkerên ku şer dike bi gurmîna çekan a ji nişka ve, ji cihê xwe hildipeke. Li aliye din jî mirov bi henekîn leşkeran û rewşa leşkerê ku hevnavê Ryan e, ji kenan zikopiştî dibe. Heke mirov temaşekirina film jî wekî xwarina dendikêni gulên berberoşk bibîne û bi tenê mebesta mirov bi hev re hîskirina dilînêni cur bi cur be, kes nikare tiştekî neyîni jî vî filmî re bi-bêje.

Lê heke yek li pey mesajeke politîk be, nikare encameke erêni bi dest bixe. Di dawiya dawî de wekî peyama siyasi di tişteku di bîra mirov de dimîne, ala DYA'yê ya ku di destpêk û da-



wiya film de hemû perdeya sînemayê dadigire û li ba dibe ye. Li aliye din heke mirov xwedîyê agahîyeke dîroka siyasi ya şerê duymîn be, pişî dîmenen hovane yên şer, dê mirov karibe besîdarî vê nirxandina nivîskara Radikalê bibe "Amerikayê ne jî bo serkeftina li dijî Almanyayê ev tevger daye destpêkirin, lê belê jî bo bibe hevparê destkeftinê serkeftiyan ev qas leşkerêni xwe dane kuştin. Lewre tê zanîn ku wê demê leşkerên Alman li hemberî hêzên Artêsa Sor têk çûbûn û bi şûn vedikişin. Bombeyên atomê yên ku Amerikayê avêtin Hiroshima û Nagazakiyê vê dîtinê diselmînin." Her wiha hinek dîmen didin zanîn ku film ne li dijî şer e. Bo nimûne, leşkerê baş li hedefa xwe dixe wekî lehengekî tê rîdan, nekuştina leşkerê alman tê rexnekirin.


Film di warê vegetina derûniya leşkeran û dîmenan de serkeftî ye. Lî belê ci cudatî di navbera awayê jiyanê ya Amerîkiyê roja îro û wan rojan de xuya nake. Henek û nêzîktêdayînên leşkerên di film de mirov dikare di nav ci-vaka Amerikayê de bibîne.

Di encamê de mirov dikare bibêje, Spielberg di warê kişandina filmêni popüler de jêhatî ye. Ev jêhatîbûna xwe di vî filmî de jî nîşan daye. Afîrînerên çanda popüler dixwazîn pêgeha xwe fireh bigirin, xîtabî her kesî bikin. Di vî warî de ev film jî serkeftî ye. Lî belê mirov nikare bibêje, dê ji bo pêşerojê jî vî filmî gelek tişt bimîne. Jixwe ev tişt ji bo afîrînerên çand popüler ne pêwîst e.

SAMÎ BERBEYAN / STENBOL

TİSK

Agirbest



BEKIR ŞİWANÎ

Bakurî Kurdistan ber le rageyendînî agirbestî sîyemî Partî Kirêkaranî Kurdistan (PKK), kewtibiwe ber reşeba û gêjekoey şerî derûni ke dewletî tirk be mebestî goşegirkirdin û tekşikandînî şorîşî gelî kurd destî dabûye. Belam hêndey nebîrd Ankara lew şewazi şereş da şikestî hêna û bew amancane negeşî ke lewe deçû pêştir nexşey bo kêşra bê. Paş kîşanewey bêdengî besekî supay turk le başûri Kurdistan, dewletî turk destî daye diblo-masiyekî nîhêni û dêbeng. Ewaney le nîzîkewê çawdêri siyasetî nawewe û derewey Turkiye deken le ber çawiyane ke siyasetî ziyyaderoyî Turkiye ew dewleley xistote rewşêkî çende dijwarewe. Supay turkîş le kaşî qonaxî şerî derûnî da û lew qonaxeş be diwawê be hemû hêzwegûşarı xiste ser Kurdistan. Qiseyek heye ke delê dirindetirin supa, ew supaye ye ke berew helderî doran deçê. Supay turkîş be niwandînî dimdanetirin û namirovanetirin reftar le şerî be zor sepêndiraw be ser Kurdistan da, ew boçûney serewe beser xoya desepênenê.

Le katêk da dar û berdî bakûri Kurdistan le şerêkî bê aman da girî girtibû û heta êstaş her desûtê, layenî kurdfî le ser daxwazî aşfîxwazanî nawxo û le welamî bangewazî dostekanî gelî kurd da le rojî yekî rezberewê biryari agirbestî rageyand. Aşfîperweranî nawxo û dostekanî gelî kurd û çendîn dewlet û rêkxrawî nêneteweyî û kesayefî siyasi û roşinbîri cihanî, be şadimaniyewe pêşwazîyan le biryari agirbest kird, çûnke ew biryare legel dawa û hîwakanî ewan da yekî degirtewe.

Belam lêre da girîng ewe ye ke aya ew layeney şerî be ser Kurdistan da sepandiwe, helwêstî ci ye? Mirov her çende le dewletî turk wird debêtewê û giwê bo lêdwanekanî lêpirsirawan radegirê û rûdaw û goransariyekan dextate ber çaw û rewş heldesengînê, debînê ke le Turkiye hêşta qisey ewane siwar e ke berjewendîyan le berewambûnî şer da ye. Hemû lêdwanekan wa degeyenin ke dewletî tirk helêkî tîrî zêrin bo pêkhênanî aşî le dest dedat û berde-wam debê le ser şer û wêrankirdinî Kurdistan û fêwtandînî gelê kurd û perêşankirdinî gelî turk. Em siyasetê dirêjepêdanî cêbêcêkirdinî ew nexşane ye ke pêştir darêjrawe bo le nawbirdinî gelî kurd û şorîş rizgarîxwazekey. Herweha sûrbûnî seranî dewletî turk le ser dirêjepêdanî şer û feramoşkirdinî hemû bangewazekanî aşî, nîşaney tênegeyiştinî general û bîrokratekanî turk e le gorankariyekan serdem û lew şinebay azadî û serbexoyiyey ke le diway rûxanî Sovêti pêşûwe helikird.

Dewletî Turk lem rojgarê da legel şoreşek rû be rûwe ke be gewretirîn bizûnewey rizgarîxwaz dadenê li cihan da. Le ber ewe karêkî sext e mirov pêşbînî rûdawekanî diway têkçûnî agirbestî layenî kurdfî bikat.

Ji bo bavê min Zeki
Tanrikulu name



Ez li ber şexsiyeta te li ber hemû şehîdên şoreşê birêz serê xwe ditewinim û vê ji xwe re wekî deynekkî dizanim. Min dengê guleyên ku bera te dane û dîmena wê rojê hîna jî bîr nekiriye. Wê rojê roj derbas bûbû ku min 9 salên xwe tije kiribûn. Ez şas û metel mabûm. Min bi tenê qîrîn û hawara dayika xwe dibîhist.

Dayika min wisa bang dikir: "Li zekî xistin, Alaçaxan li Zeki xist." Wê demê min telefonî dapîra (diya bavê xwe) xwe kir. Min jê re got: "Li bavê min xistine". Ez wê demê pir bêdeng bûm. Sedemê bêdengiya min ji ber ku min pir ji te hez dikir. Ez keça te bûm û girîn li min nedihat. Ji wexta ku ez keçeye biçûk bûm, min ew şireten ku li te li mindikirin, dibîhist. Li hemberî wan gotinan ew bisîrîna li ser lîvîn te û ew bersivîn te yên bêtîrs mîna duh têr bîra min. Dema ku te ji wan re digot: "Ji vira çûyîn, çewtî ye, emê erdê xwe terk bikin û bi ku de herin? Dîvî em nerin." Wê çaxê jî te ew berxwedêriya xwe ya rengîn nîşan dida.

Wê roja bavê min, roja 2'ye rezbera 1993'yan xayinan kemîn danibû. Di nava telaşa kuştina Dr. Zeki de bûn. Bi koçkirina te ya fizîkî ne tu û ne jî ramanen te qedian. Bi hezaran Zeki, iro serê xwe hildidin. Ez 9 salî bûm, zarokek bûm, di nava ês û eleman de dilê min dişewitî û bi şâşî dîjîyam. Erê bevê min tu ne yê yekemîn ê ku hate qetîkirin bûyi.

Ev fikir an baweriya min a bi têkoşînê bû. Nizanîm min ew roja reş û guleyên ku bera dahatuya me dan bi behnfirehî anîn bîra xwe. Di ser şehadeta te re 5 sal derbas bûn. Ez mezin bûm. Birayê min jî mezin bûne. Di vê demê de ez hîni tiştekî bûm; "jihevûdabûna fizîkî, li ber şehadeta we ya bi rûmet bêwate û biçûk dimînîn".

Bavê min ê delal, ji ber ku tu kurd bûyi wan tu kuştî Navê van kuştinan kiribûn "faîfî meçhûl" demeke dirêj li ser rîk kirin. Iro jî di raporê xwe de ew qetîlamîn xwe eşkere dikin. Min ev pir bas fêm kir û ez fêr bûm ku, "li Kurdistanê zarokî tune ye". Em ji bo şekir negirîyan. Ji bo gerê jî negirîyan. Heta dema wan bavê me kuşt jî, em negirîyan. Ji ber ku li Kurdistanê zarokbûn tune ye. Hêstîren çavê me bûne cemed û nayêñ xwarê. Ez niha pir xurt im, her tiştî pir bas fêm dikim.

Niha em hatin van rojan. Kuştin, koçberîyen fizîkî baweriya me ya bi dozê re zexm kir. Têkoşîna me ji bo ku em layiqî şehîdên bibin e. Careke din li ser şexsiyeta te li ber hemû şehîdên şoreşê em birêz serê xwe ditewinîn.

Riya we riya me, baweriya we ronahiya me ye.

KEÇA TE SEDA TANRIKULU

Ji bo zarokan kursê karîkatûran

Di bin banê NÇM'ya Stenbolê de bo zarokan kursê karîkatûrê hatin destpêkirin. Kursê bi beşdariya 10 zarokan sê hefta berê dest pê kir û xebat rojên şemî û yekşemê pêk têr. Kurs ji hêla Ahmet Gölbaş ve têr dayîn.

Ahmet Gölbaşî li ser armanca vê çalakiyê ditin û ramanen xwe wiha anîn zimên.


Ji bo çi zarok û ji bo çi karîkatûr

"Berî her tiştî armanca bingehîn derxistina kovareke xêzan a xwerû bi kurdî ye. Ji bo vê yekê jî çavkaniya bingehîn û madeya me ya xam zarok in."

Li gorî gotinê Gölbaş ji bo ku wê nû bê destpêkirin, pir avantajên wan hene, lewre tu pêşdarazîyen zarokan tune ne. Ew dide zanîn ku kovarê heyî yên li Tirkîyeyê ji armanca xwe dûr ketine û ji pêşketinê re ne vekirîne. Ew dibêje ku hemû kovarê mîzahî di bin destê feraseta (anlayış) cend kesan de ne."

Gölbaş, ji ber van hemû sedeman pêkanîna tiştekî xwerû, yanî xweserî kurdan du caran girîng dibîne. Wî wiha got: "Yek kovarê li Tirkîyeyê ji me re dibin mînakîn nebaş. Duyemîn, em tiştinê nûjen û ku ji aliyê wateya xwe ve ji wan pêşketîfir e di-xwazin. Belê ev rîwîtiyeke dirêj e. Em niha tenê bawer in ku emê bi ser bikevin."

Li gorî wî, xêzçêkerên jêhatî ên kurd hebûn, lê di nav têkiliyên heyî yên piyasayê de hemû dejenere bûn, ji hev dûr ketin. Lî niha ji ber Tevgerra Azadiyê wateyek nû li jiyanê hatîye barkirin û ev bêhnê dide wan. Gölbaş ji bo vê dîtinê fîkrêن xwe wiha anîn zimên: "Yanî wisa tê xuyan ku di vî warî de ji bo pêşketina çand û



Zarokên NÇM'ê bi kîfxweşî beşdariyê di dersa karîkatûran de dîkin. hunerê her tiştî heye. Em di nav vê qadê de dîsa heyecan digirin, dîsa projeyan pêk tînin û ya girîng jî di vê pêvajoya kurt de em hin encaman bi dest dixin. Çimkî tiştekî gelekî vekirî heye ku pir tiştî hatine jiyandin ku nehatine gotin, pir hest hene ku nehatine deranîn ."

Li gorî wî, heta niha kovarê heyî derbirina hest û dilînan bidin aliyekî, li dijî hebûna wan derketine. Her wiha ew balê dikişîne ser dernebirina welatparêziyê di berhemekî sînemaya de an di romanekî de rewşa günden şewitandî, gundiyanî koçbûyî û psîkolojiya wan. Piştre jî ew, afirandina berhemîn çandî wekî riya derbirinê bi nav dike. Gölbaş diyar dike ku ev sedem hemû wan dikişînin ber bi pêkanîna tiştîn nû ve. Ew wiha dibêje: "Di pêkanîna van hemû armancan

de dibe ku feraseta dewletê an ferasa ta serdest astengiyan derxe, lê ew a tengî hêzê didin me."

Armanca vê xebat wekî afirandina nifşeve nû bê rîdan û tê gotin du sal in ku li ser xebateke bi vî re gî hatiye fikirîn.

Niha ji bo handana (motîve) sagtan gelek tiştî têr kîrin, her wiha pêdakirina pêdiviyê wekî pênuş, kaxiz, dokûman û hwd. wan girtiye se xwe.

Li gorî agahiyê Gölbaş, ji bo germbûna li xebatê û pêşketîna çand çûna pêşangehan, çavdêriya kovare ewrûpi, lêkolîna li ser kovarê di de di nav planêwan de ne.

Ahmet Gölbaş wiha dawî li gotin xwe tîne: "Di vir de wekî her xebat domdarî û bi bîryarî girîng e."

EVİN RONÎ / STENBO

Kursê ji bo zarokan bi awayekî berfirehtir didomin

Ji bo perwerdeya zarokan li Navenda Çanda Mezopotamyayê û hemû şaxen wê kursê ji bo zarokan wekî kursê ziman, muzîk, folklor, resim û şanoyê didomin. Kursa karîkatûran jî beşek nû ye ku ketiye nav bernameya Navenda Çanda Mezopotamya. Her wiha ev xebat ligel mohrikina salanon jî ranawestin.

Li ser xebat û kursê ji bo zarokan me ji NÇM'ê û şaxen wê ev agahî standin:

NÇM Stenbol: Niha tevî yên berê 110 zarok beşdarî kursan dibin. Kursê ziman, tiyatrosu, muzîk, folklor, wêneyan hene. Kursa karîkatûran nû vebûye. Ji bo zarokan li ser projeyen nû jî tê fikirîn.

NÇM İzmir: Kursê ziman û çand, resim, muzîk, tiyatrosu, sînema, folklorê hene. Hejmara kursiyeran 90 e.

NÇM Mersin: Niha 60 kursyer hene. Kursê heyî ziman, muzîk, folklor. Wê kursa resiman jî vebe.

NÇM Edene: Ji ber mohirkirina hemû odayen xebatê, xebatê zarokan sekînîne. Wê di demeke kurt de pişti cih girtinê, li vir jî kursê ziman, muzîk, folklor, resim û tiyatroyê ji bo zarokan dest pê bikin.

NÇM Amed û Ruha: Ev şax hatine girtin. Xebatê zarokan bi awayekî giştî li şaxen HADEC ên van bajaran, bi beşdariya 25-30 kesan didomin.

Berhevoka çend pêkenokan: “hindik-rindik”

Tê zanîn ku her civak li gorî hin rîzîk û pîvanan saz dibe. Ger yek ji répîvanen ku civakê saz dikin kêm be hevkêseya civakê ji dirûxe.

Pêkenok yek ji wan hêmanan in ku ne li gorî pergala civakê ne. Qerf û pêkenok di heman demê de di xwe de giyaneye “anarsîk û jirêderketî” dihewînin, bûyer û rûdanen li derveyî rîz û rîçikên civakê dinimînin. Bi taybetî ji ev yek di civakên feodal ên ku bi répîvanen hişk têne birêveberin de xwe bêtir dide der. Di van civakan de ji ol bigire netanî tekiliyên zayendî nîqaşkirina her tişî beramberî otosansura civakê dimîne, li ser gelek babetan nîqaşkirin qede-xe ye.

Lê civak ji bi awayekî, bi rîbazine cihêreg hest û daxwazên xwe yên qedexekirî dide der. Kesên wekî Mele Nesredin (Meleyê Meshûr) diafirine.

Civkaka kurd ji yek ji wan civakan e. Lewre di civaka kurd de dengbêj û kesên qerfok van hest û daxwazên civaka kurd bi metodên xwe tînin zimên. Ji ber vê ji pêkenî di zargotina kurdî de cihêkî berfireh digirin.

Di vê dawiyê de ji aliye Weşanxane-ya Apecê ve bi navê “hindik-rindik” pirtûkek hate weşandin. Pirtûka ku ji pêkenokan pêk tê ji aliye Zinarê Xamo

ve hatiye amadekirin. Xamo di Rojnameya Armanc de, di quncikê bi navê “hindik-rindik” de dest bi nivîsandina pêkenokan kiriye. Piştre biryara berhevkirina wan daye, xebata xwe dorfi-rehtir kiriye û di encamê de wekî pirtûk çap kiriye.

Pirtûk ji sedan pêkenokan pêk tê, tê de digel pêkenokên gelêri pêkenokên ku di naveroka xwe de motifên siyasi û olî dihewînin pir in. Her wiha ligel wan, pêkeniyênu ku li dora Mele Nesredin, Temel hwd. hatine honandin bi giranî cih digirin. Dîsa pêkenokên ku li ser bûyera 12'ê rezberê hatine gotin, pêkenokên gelê Ewrûpa û yên ku ji nav gelên din hatine girtin balê dikişînin.

Mirov dikare bibêje ji pêkenokên gelêri yên kurdan bêtir pêkenokên gelên din din di nava pirtûk cih digirin.

Bi vê ji baş diyar dibe ku xebateke hûrbînî û birêkûpêk nîn e. Her wiha dema li gorî qaydeyên rastnivîsa kurdi pirtûk bê dahûrandin gelek kemasî xwe didin der. Bi taybetî di bikaranîna cînavk û daçekan de, di taybetiyê zayenda peyvan de ev yek berbiçavtir di-be. Bo nimûne, şûna, nizanibû ew roj ci roj e. “wê roj ci roj e”, li cihê ku yekî elewî di ber camiyê re dibihure’ bê gotin, “ji ber camiyê dibihure” hatiye gotin, dîsa li şûna ev muzyea mîli ye “vê-

ya muzyea mîli ye”, kevir avêt li teyr da “ji teyr da”, hatiye gotin. Her wiha di bikaranîna navê taybet de ji mirov dikare leqayî van kîma-siyan bê. Bo nimûne, İnönü “înunu”, Öz a l “ozal”. Di hin pêkenokan de tirkî fikirin ji bi awa-yekî ser-girtî xwe nîşan dide. Wekî mî-

nak, kîç dikir deve. Tê zanîn ku ev bi-wê di tirkî de “pireyi deve yapmak” e.

Digel van kemasîyê ji, mirov dikare bi saya vê pirtûk bi peyv û biwêjên

(pêkenîn)



kurdewarî tûrikê xwe tijî bike û her wiha bi saya pêkenokan geleb taybetmen-dî û xweseriyyê civaka kurd analîz bike.

SERWÎSA ÇANDÊ

Humanîzma Apê Mûsa û dilreşîya roma res

HASAN KAYA

Di gelek nîşar û gotarêne serokatiya Partiya Karkerê Kurdistanê de, mirov rastî têgîha “tevgera mirovahiyê” tê. Bi şêweyekî ku bala her kesî bikşîne tê gotin ku parti, artêş, enî, yekîti û bi kurî tevgera gelê kurd, “tevgereke mirovahiyê” ye. Helbet girîngîya îdeolojiyê, ya politîkayê tê zanîn. Bêyî bûyîna îdeolojiyê, mirovatî, mirovperwerî bi serê xwe zêde tiştekî ifade nakin lê di vê mesajê de tiştekî ku tê vegotin an ji tiştekî ku ez dixwazim jê fêhm bikim ev eku “mirov” di ser her tişti re ye. Li cîhanê mirov ji her tişti bi qedr û qîmetir e. Lewre divê ku mirov ji pîvanen mirovahiyê, ji rîz û rîçikên mirovahiyê dûr nekeve. Heta ji mirov tê, divê mirov van rîz û rîçikan li cîhanê, li welatê xwe pêşî ji di nava xwe, di dil û mîjîye xwe de serdest bike.

Di vê heftîa bîhurî de, ev nîrîna jorîn di serê min de zelaltir bû. Bi mebesta bîranîna şehîdbûna Apê Mûsa, me ji wekî Enstîtuya Kurdi ya Stenbolê hînek çalakî li dar xistin. Di çalakîyên ku li bajarê Mêrsin, İzmir û Stenbolê hatin lidarxistin de, gelek endamên Enstîtuyê yên ku hevalti bi Apê Mûsa re kirine û ji derveyî Enstîtuyê ji hînek mirovîn ku bi Apê Mûsa re

mane beşdar bûn. Gel, bi baldarî guhê xwe dida ser axaftinê.

Bi awayekî dorfirê di heqê Apê Mûsa de hate axaftin. Di nav ên ku axivîn de mele, yên ku xwe sosyalistên kurd dihesibînîn, ên ku xwe sosyalistên tirkî dihesibînîn, welatparêz, sosyal demokrat hebûn. Bê iştîsna hemû beşdaran, tevî kurê wî Dicle Anter ji behsa gelek taybetiyê wî kirin. Lê hemû ji cûn û hatin li ser humanîstiya wî rawestiyan. Ango mirov dikare bibêje ku dîtna wan a hevpar û di heqê Apê Mûsa de “humanîzm” bû. Heta, dema ku camêrê bi navê Muzafer Özkolçakê ku bi eslê xwe tirkejî ji devera Makedonyayê ye bîranînen xwe anîn zimên, xwe negirt û hêstir ji çavên wî bariyan. Bi gumanâ min tiştekî ku ev kalê Makedonyayî yê ku demekê li “Dicle Talebe Yurdu” ya ku Apê Mûsa pîrsiyarê wê bû, mabû, dabû gîriyandin, dilovaniya Apê Mûsa bû. Xisleta ku Apê Mûsa nemir kiriye, nav û dengê wî bîriye nav gelên din, humanîstiya wî bû. Jixwe tiştekî ku ew ber bi welêt ve kîşandibû û ew heta bi şehadetê ji biribû dîsa humanîzm bû. Ma daxwaza welatekî rîzgarkî, xwestina welatekî azad û serbixwe ji, dîsa ne ji bo mirovan e? Îdeoloji û polîtikaya ku ji humanîzm, ji wijdan, ji dilovanî û ji dil dûr be ez bawer dikim ku nikare li welatekî hêşîn bibe, hêşîn bibe ji nikare zêde bijî.

Ku rojekê lêkolnîn dorfirê li ser Tevgera Azadiyê bêne çekirin, ez bawer im ku sede-meke bingehîn a serkeftin dê wekî humanîzma partiyê û ya serokatî û ya kadroyan were dest-nîşankirin.

Di vê pêvajoya agirbestê de gotineke Apê Mûsa tê bîra min. Digot: “Dema ku rîveberên tirk qala şefqetê, qala dilovaniyê û dîlîzîyî bikin, hûn ber bi ciyê ve bibezin. Lewre ku ew qala şefqetê dikin, mutleqe ew qirkirin û felaketekî tînin serê me kurdan.” Jixwe Demirelê ku wê demê serokwezîr bû demeke kurt beriya ku Apê Mûsa bê qetilkirin gotibû, ‘emê ji hemwelatiyên xwe yên kurd re bi rehî bin, emê destê dewletê yê dilovan dirêjî wan bikin. Em hebûna kurdan dipejirînîn.”

Şefqeta wan, bû qetilkirina Apê Mûsa, hilweşandina Şîrnex, Lîcê û bajarê din û ferma kuştina heft heşez hezár welatparêzen kurd.

Divê mirov vê gotina Apê Mûsa tu caran ji guhê xwe dernexê, di pêvajoya aştiyê de xwe, saziyên xwe biparêze, yekîtiyeke xurt pêk bîne û bi dengekî muezem daxwaza xwe bigîhîne raya gişti, dengê xwe bigîhîne yar û neyaran. Ji bo vê yekê ji mîtingen ku dê li Amed û Stenbol, Wan, Batmanê û li cihê din çêbibin ji me re fersendên mezîn in. Divê ku beşdarbûn ji me re mîna bicihanîna wezîfeyeke bi şeref û namûs be. Divê em hemwelatbûna xwe bidin nîşan. Piştî van mîtingen ji dê gelek çalakî bêne li dar xistin. Her sal û her car çalakîyên wiha bi dest me nakevin. Divê ku em xwe û dost û naskirî û cîranen xwe ji wê tamê, ji wê lezeted bêpar nehêlin. Berdana Serokê HADEP’ê birêz Murat BOZLAK û ya hevalen wî dê van mîtingen bi coştr bike, ew dê bi xêr bêne nav gel. İro roja yekîti û roja xebatê ye. Serkeftin ne dûrî me ye. Ku ev fersend ji dest me derkeve, careke din bi zor emê bi dest bixin.

Pir Ali Haydar Cilasunî ra veyndayîno watedar:


“Xo goreyê meşt hedre kirê”

“Ez kurdî nêzana. Na kemiyîna. Lazim o ke ez kurdî bizanî. Çimke jew mardim gerek verê heme çî ziwanê xo bizano. Na kemiyîn mi de esta. La belê ez soz dana şima. Hetanî serna ewro, ezo na kemiyîn ra bixelsiyî. Kurdî bimûsî û serna ewro nê bernamî kurdî virazî.”

Pîr Ali Haydar Cilasun pancakes rojan de finê, MED-TV de bernameyê (programê) qeçekan (domanan) virazeno. Bername her çiqas qandê qeçekan viraziyo jî, kes şeno ê bernamî zey bernameyê pîlan û zey bernameyê perwerdeyî jî bihesibno. Çimke kes, ê bernamî de xeylê çî müsayena piya, kemiyanê xo û serdaranê komelanê ma kurdan vineno. Coka jî wexto ke, kes ê bernamî temaşe keno, nêwazeeno bername biqediyo. Xora temaşkarê ke raya telefoniya tewrê bernamî benê, na wasten anê ziwan. Wazeñê Pîr Ali Haydar Cilasun pancakes rojan de finê nê, hefta de finê bername virazo.

Kes meşt fikiryayin müseno

Ali Haydar Cilasun, mabenê qisanê xo de mesajê winî rindî dano ke, kes a saet xo ra vano, mi hetanî nika tevawo wînayîn çira nêkerd? Ninan fikiryo u qehriyeno xo ra. Yanê wasten, vaten û pawitin esto. La belê xebato ke ìnan biyaro ca çiniyo, oyo ke esto jî tayn o. Ancî wexto ke, ê



berna-
mî temaşe
keno, meşti fikiryayin müseno û kes şeno wina jî vajo. Pir Ali Haydar Cilasun her bernameyê xo de, meşti sero vindeno û wazeno ke her hetan (kiştan) ra hedrekarîna meşt viraziyo. Yanê Cilasuno vano ke, wexto ke madewleta xo ronê (ava kerd) kamo karê diplomasî, perwerdeyi, teknikî, zanistî u siyasetî bikiro. Coka lazim o nê mardimî nika ra biresiyê. Qandê nînan jî gerek komeleyê kurdan de kursî bidiyê. Her komeleyê kurd bibo

zey zankeyan (üniversite) û mekteban.

Lazim o kes verî ziwanê xo bizano

Kişa bîn ra, jû kemiyîna bernameyê Pir Ali Haydar Cilesuni esta. Xora Cîlasûn xo jî a kemiyîn ser ro vindeno; kurdî nêzaneyîn. Cîlasun her bername de, na mesel ano ziwan û xo rexne keno. Cilesunî kurdî nêzanayîn ser, beranameyê peynî (şanê 22'ye meng) de wina vat: “Ez kurdî nêzana. Na kemiyîn a. Lazim o ke ez kurdî bizanî. Çimke jew mardim gerek verê heme çî ziwanê xo bizano. Na kemiyîn mi de esta. La belê ez soz dana şima. Hetanî serna ewro ezo na kemiyîn ra bixelsiyî. Kurdî bimûsî û serna ewro nê bernamî kurdî virazî.”

MED-TV ra wastena temaşekaran

Rastî wexto ke, kes nê vatenanê Pir Ali Haydar Cilesûni ser ro fikiryo, mahna u qimetê ziwanî heveyena rind müseno. Bifikirî jew mardim 78 ser re wo û vano: “Hetanî nika kurdî nêmûsayin kemiyîn a. Ezo ewro ra tepiya giranî bidî kurdî müsayîn û serna ewro nê bernamî kurdî virazî û şarî xo ya ziwanê xo ya qisey bikirî.”

Baweriya min a wa ke, mesala ziwanî de lazim o ke her kurd zey Pîr Ali Haydar Cilesuni bifikirî u her kurd zey ey xo mecbûr bivîno ke bi ziwanê xo qisey bikrî u ziwanê xo bizanê. Coka jî lazim o goş bidiyo nê vatenan. Zey kesanê bînan ezo jî wazena Ali Haydar Cilesun, pancakes rojan de finê nê, hefta de finê bername virazo. Ez bawer kena serdarê MED-TV'ye goş bidê na wastena ma temaşekaran.


MEMED DREWŞ

Eywana
NÇA
raceniyê

T erorê polisanê Stenbolî yo navandanê çandan ser ra kemî nêbeno. Polisanê Stenbolî 18'ê meng de Navenda Çanda Alternatifî rî (Alternatif Kültür Merkezi) vardayın viraşta, nasnameyê meymanan kontrol kerd û eywana navenda çandî jî bahneyê bêdestür film müsnayina racenê. Vardayın ser, xebatkaranê Navendê Çandê Alternatif jew eşkerakerdina vardayın û racenayînê eywana ci protesto kerd û wina vat: “Vurnayînê serdaranê emniyetê Beyoğlu peyra, serdarê neweyê, ze ke xebera amayîn bidê, iyê navandanê çandan, komalanê demokratian û Mayanê Şemî rî vardayın virazenê.”

Xebatkaranê Navendê Çandê Alternatifî qanûno ke eywananê navandanê çandan de, bêdestür film müsnayin qedexe keno, ard vîrî û vat: “No qanûn hemverê beyanameyê haqê mardiman o. Çimki no qanûno sînema, navêndê çand, bar, pavyon û cafeyan jew statû de hesibneno û lazim o ke no qanûn hewadiyo. Navendê çand û pavyon eynî statû de mehesibîyo”.

Ancî xeylê navandanê çandan û xeylê komalanê demokratian vardayın û racenayînê eywana Navendê Çandê Alternatif protesto kerd û wast eywana navendê çandî rojê ravey abiyo.



WELAT
ROJNAMEYA HEFTESİ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURI KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37
FAX: 251 95 85

■ Gerineyedî Gîşî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN
■ Berpîrsê Karên Nîvîsa-an
(Yazî İşleri Müdürü)
M. SALÎH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayım Koordinasyon:
Gündem Basım ve Yayımcılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRİN
BİRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliğimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
■ Münchén:
(Nûnerî Gîşî yê Ewrûpâyê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:

İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yusiv

Li gel hemû tevkujî û çewsandinan kevneşopî didome

w humanîstekî ronîdar bû



Li salona HADEP'a Bağcılarê ji aliye û İnstîtuya Kurdi ve ji bo bîranîna şeşemîn salvegera qetilkirina Musa Anter forûmek hate lidarxistin. Kurê Musa Anter Dicle Anter, Birêveberê HADEP'a Stenbolê Mahmud Eşiyok, Tarik Ziya Ekinci, lêkoliner İsmail Göldas, Rozerîn Kaya, Muzaffer Özkarçak, weşanîkar Sırri Öztürk, Feqî Huseyn Sağrıç wekî axivger besdari panelê bûn. Her wiha ev kes û sazî ji besdari forûmê bûn: Ji Ülkede Gündemê Ali Doğan, Azadiya Welat, İÇD, ÖKD, GÖC-DER hunermend Yusuf Çetin.

Serokê İnstîtuya Kurdi Hasan Kaya di destpêka çalakiyê de ahaftinek kir û dazanîn ku, dema ku mêtfingeran peyva dilovanîyê bi lêv kir hûn berê xwe bidin çiyan. Hêviya me mezin e, em ê rojekê şehîdên xwe li ber gorën wan bi bîr bînin. Pişti Kaya kurê Apê Mûsa, Dicle Anter bi kurtayı li ser jiyanâ wî rawestiya û diyar kir ku, ew di jiyanâ xwe de bi tevayî çar salan li cem bavê xwe maye û pişt re jî got: "Hûn çiqasî zarokên wî bin ez jî ewqasî." Her wiha Anter got, ew bo hemû gelên Anatoliyê û Kurdistanê ronahî bû. Tarik Ziya Ekinci di destpêka ahaftina xwe de got ku li ser Musa Anter ahaftin geleki li wî zor tê, dilê wî dişe. Pişti van gotinan Apê Mûsa wiha da nasin: "Berî her tişti ew miroverwer bû, di nav ronakbirêñ kurd de nûnerê humanîzmayê bû. Aliyê wî yê din zanabûn û şarezbûn bû. Mûsa bi awayekî tund li dijî ferasesta feodal û bîrdoziya olî ya paşverû derdiket, rexneyîn tûj li qederperestiyê digirtin."

Wî xwe di têkoşînê de mecbûr didit

Lêkoliner İsmail Göldas diyar kir ku Musa Anter di mercen herî giran û dijwar de riya têkoşînê hilbijartîye. Kesî Musa Anter bo têkoşînê mecbûr nekiriye. Lî wî di têkoşînê de xwe mecbûr diditiye. Li gorî Göldas ronakbirêñ ku didin hene û yên ku distinîn hene. Musa Anter yek ji wan kesen

ku didin bûye.

Nûnerê Weşanxaneya Sorun Sırri Öztürk da zanîn ku mêtfingeran peyva dilovanîyê bi lêv kir hûn berê xwe bidin çiyan. Hêviya me mezin e, em ê rojekê şehîdên xwe li ber gorën wan bi bîr bînin. Pişti Kaya kurê Apê Mûsa, Dicle Anter bi kurtayı li ser jiyanâ wî rawestiya û diyar kir ku, ew di jiyanâ xwe de bi tevayî çar salan li cem bavê xwe maye û pişt re jî got: "Hûn çiqasî zarokên wî bin ez jî ewqasî." Her wiha Anter got, ew bo hemû gelên Anatoliyê û Kurdistanê ronahî bû. Tarik Ziya Ekinci di destpêka ahaftina xwe de got ku li ser Musa Anter ahaftin geleki li wî zor tê, dilê wî dişe. Pişti van gotinan Apê Mûsa wiha da nasin: "Berî her tişti ew miroverwer bû, di nav ronakbirêñ kurd de nûnerê humanîzmayê bû. Aliyê wî yê din zanabûn û şarezbûn bû. Mûsa bi awayekî tund li dijî ferasesta feodal û bîrdoziya olî ya paşverû derdiket, rexneyîn tûj li qederperestiyê digirtin."

Apê Mûsa gerîlayê çandê bû

Wekî tê zanîn "Xelata Rojnamegeriyê ya Musa Anter û Şehîdên Çapemeniyê" cara pêşin ji aliye Özgür Gündemê ve hate dayîn. Piştre bi dorê Özgür Ülke, Yeni Politika û Rojnameya Demokrasiyê ev kar mandom. Ev du sal in Ülkede Gündem ve kevneşopiyê didomîne. Roja 20'ê rezberê li Navenda Çanda Mecidiyeköy ji aliye Ülkede Gündemê ve cara şeşemîn Merasîma Xelatdayînê ya "Musa Anter û Şehîdên Çapemeniya Azad" hate lidarxistin. Di ahaftinan de bi giranî li ser girîngîya jiyandina kevneşopiyâ çapemeniya azad hate rawestin. Her wiha hate dayîn ku dayîna van xelatan li dijî çewsandin, komkuji, qedexekirin û sansûran helwestigirtin e.

Berî merasîma xelatdayînê Gerînendeyâ Ülkede Gündemê Yurdusev Özsökmenler ahaftinek kir. Özsökmenler di ahaftina xwe de diyar kir ku jiyandina ve kevneşopiyê geleki girîng e. Lewre ligel hemû tevkujî û çewsandinan ev kevneşopî bêrawestin didome. Özsökmenler gotina xwe wiha domand: "Apê Mûsa ne tenê bo kurdan bo hemû gelan sembola aşî û ronahîyê bû. Banga wî ya aştiyê iro li çiyan, gundan û metropolan tê bersivandin, bangâ agirbestê ya Serokê PKK'ê bersiva daxwaza wî ye." Pişti ve ahaftinê Koma Amed konsekerek pêşkêş kir û danışana sînevîzonê hate pêşkêşkirin. Bi tevayî di sê besan de xelat hatin belavkirin. Beşa yekemîn nûçe, beşa duymîn wêne û beşa sîyemîn karîkatûr bû. Her wiha Serokê Gişî yê HADEP'ê Murat

Bozlak û Serokê Komeleya Mafen Mirovan Akın Birdal hêjâyî Xelata Taybet a Rûmetê hatin girt. Li ser navê Murat Bozak Bahattin Günel û li ser navê Akın Birdal jî keça wî Evren Birdal xelat girtin. Di beşa nûçeyê de kes hêjâyî xelata 1. û 3. nehate dîtin. Xelata duyemîn ji UBA'yê Ahmet Ergin girt. Di beşa wêne de xelata yekemîn ji Turkish Daily Newsê Selahattin Sönmez, ya duyemîn Ali İhtiyar, ya sîyemîn ji Rojnameya Halkın Günlüğü Mecit Kapaklı girt. Di beşa karikaturê de xelata yekemîn Behîc Yalçınoglu, ya duyemîn Hicabi Demirci, ya sîyamîn jî Mustafa Yıldız bi berhemâ xwe ya bi navê "Barış" girt.

Kes û saziyên ku besdari Merasîma Xelatdayînê bûn

Ji HADEP'ê Cigirê Serokê Gişî Bahattin Günel, İ.Tepê, M.Emin Altun, endamê MYK'ê M. Nuri Güneş, endama PM'ê M. Alp, M. Şakar, Serokê Gişî yê DEHAP'ê Mehmet Abbasoğlu, Eren Keskin, Tomris Özden, Mahmud Özgür, diya Eva Junkhe Doris Junkhe, Dicle Anter, Ercan Kanar, T. Ziya Ekinci, R. Zarakolu, Eylem Birdal û Emin Karaca.

Kes û saziyên ku peyam şandin

Yaşar Kaya, MED-TV, Mazlun-Der, Leyla Zana, Orhan Doğan, Selim Sadak, Hatip Dicle, Fikret Başkaya, İsmail Beşikçi, giřîgîhêñ Bayrampaşa, Bursa û Aydın Sadrettin Aydinlik, Ferhan Güllü, Sabri Ok, Şamil Batmaz, Wezîrê Dewletê Salih Yıldırım, Hüsamettin Cindoruk, Ji FP'ê Abdülkadir Aksu, Bahri Zengin Mebûsên CHP'ê Algan Hacıoğlu, Murat Karayalçın, Mehmet Sevigen, Mustafa Kul, Sinan Yerlikaya, Yılmaz Ateş, nîvîskar Hasan Kiyafet, Cemşid Bender, Naci Kutlay, Şüküru Erbaş.

MEMED SERHEDÎ

Apê Mûsa

Zarokên te xwe b
çekan xemilandine

Piştî şes salan dîsa em û çekda
Prê çand û zimanê kurdî Apê
Mûsa li Navenda Çanda Mecidiyeköy bi hev re ne. Belê dîsa hemû
çavan li hev dinêri û bêriya salan
a ji hev dûrketinê ji ser xwe di
avetin. Bi saya vî çekdarê şarista
niya nû, di şeşemîn salvegera bîr
nîna wî de gelek kes gîhîştin hev
û her diçê bêhtir kes li hev dici
vin. Ji Amedê, Batmanê, Rihayê,
Sêrtê, Erzeromê, Xarpêtê, Bilisê
Wanê, Mêrdinê û ji Mûşê bi gîsti
ji hemû bajarêñ Kurdistanê mal
batêñ şehîdan û nasen wan xwe
gîhandin şeva bîranîn û xelatdayî
na pakrewanê çapemeniya kurd
Di şeva xelatdayînê de Cengiz li
Hafiz, Hafiz li Yehya, Yehya li Hu
seyen, Huseyn li Nazim, Nazim li
Ferhat, Ferhat li Ayselê û hemû
kan li Apê Mûsa meye dikir. Apê
Mûsa jî li çinareke ber deryayê
mêze dikir. Wê deryayê jî berê
xwe dabû Kurdistanê û xelatê
xwe hem bi coş hem jî bi dilekî
jandar navgêri mirovahiya bindes
dikir.

Belê masiyê li qêrâxa wê der
yayê li wî temaşê dikir, ji destê
wan tiştek nedihat. Bi çepikan di
lîn xwe bi dilê wan ve dikirin
yek. Her wiha şervanê gîrîgehar
ji nav wê deryayê silav û hum
meten xwe pêşkêşî merasîma xe
latdayînê kirin. Ji oldaran bigirin
heta koministan li ser şewqa ku
xwe ji ser wê deryayê dida çavê
temaşevanan sekinin. Tîrêjîn ro
nahiya rastiyê bandor li serbazan
jî kiribû. Balkêş bû ji gelek rî
beren hikûmetê jî mesaj hatin, lê
belê helwesta gel diyar bû. Ew
hatin protestokirin. Belê çekdar
rastiyê newestiyabûn, newes
tiyan û nawestin jî. Apê Mûsa û
hemû şagirtên wî û zarokên wî
xwe bi çekan xemilandibûn.
Zarokên Apê Mûsa mezin bûbûn
û êdî dikaribûn li ser piya
bisekinin. Sonda hemûkan yek bû,
em xwe ji qada şerê rastî û
mirovahiyê nadîn alî. Ger mirin
be mirin, hebûn be hebûn.

A. ALTUN